li gorî min <i>syn. bi ya min</i>	for me, in my opinion - <i>li gorî min şirîntirîn cilên cîhanê ne</i> (In my opinion, they are the prettiest clothes of the world.)
şirîn	sweet, cute, pretty, pleasant
cîhan <i>f. syn. dunya f.</i>	world, globe, earth
havîn <i>f.</i>	summer
ez bawer dikim	I suppose, I think, I believe
şev <i>f.</i>	night
mêvantî	being a guest
suhbet	chat, talk, conversation
germ	warm, here: nice
pere <i>syn. dirav</i>	money
erebe <i>syn. seyare, tirimbêl</i>	car, vehicle
hewa <i>m.</i>	weather
fêkî	fruit
sebze	vegetables
zêde	abundant, much
kurt	short
xweş	good, fine
xweşik	pretty, pleasant, cute
dûr	far
girîng	important, essential
teng	narrow
bedew <i>syn. ciwan, spehî</i>	beautiful
zehmet <i>syn. zor</i>	difficult
xerab	bad, evil, defective, broken
dereng	late
rehet	comfortable, easy
erzan	cheap
qelew	fat, big, large
bilind	tall
ciwan	young
zirav	thin, slim, delicate
heke <i>syn. ku, ger, eger, heger</i>	if (see grammar section for details of the present conditional)
helbest <i>syn. şîr</i>	poem
bajar <i>m. syn. şehr</i>	town, city
kurdewarî	Kurdish, according to Kurdish tradition

mîna <i>syn.</i> wekî	like – <i>ez jî mîna te xwendekar im</i> ‘I am a student like you, too’
rûbar <i>m. syn.</i> çem	river
bêdeng	silent
rû <i>m.</i>	face
dev <i>m.</i>	mouth
av <i>f.</i>	water
berf <i>m.</i>	snow
bêdengî	silence
dever	region, place
eşq <i>f. syn.</i> evîn	love
şîv <i>f.</i>	dinner
bimirin	(if) I die (1 sg. form of conjunctive for the verb <i>mirin</i> ‘to die’)
çavdêrî <i>f.</i>	observation
yek	one, unite
cîran	neighbour
ji nivê riyê	from the half way
şaş	wrong, mistaken
betlane	holiday, vacation
man	to stay (<i>mîn-</i>)
xwendin	to study (<i>xwîn-</i>)
avjenî kirin	to swim (<i>avjenî k-</i>)
dîtin	to see (<i>bîn-</i>)
hez kirin	to love, to like (<i>hez k-</i>)
kêşan	(1) to pull (2) to last (3) to smoke (<i>cixare kêşan</i>)
kirîn	to buy (<i>kir-</i>)
standin	to take (<i>stîn-</i>)
şandin	to send (<i>şîn-</i>)
av dan	to water (<i>av d-</i>)
vegerîn	to return (<i>veger-</i>). The causative form of this verb is <i>vegerandin</i> (<i>vegerîn-</i>)
mirin	to die (<i>mir-</i>)

LESSON 7**INTRODUCTION**

In this unit you will learn about the simple past tense and the past continuous tense. At the same time you will get to know how to express past habits.

By the end of this lesson you will be able to:

- Express past events,
- Conjugate the verbs in simple past and past continuous tense,
- Detect and use the nouns in oblique case in different positions.

1. Text: Dawiya Heftiyê *The Weekend*

Zelal and Cindî are speaking about the weekend in school canteen at a break-time.

Zelal: Cindî, dawiya heftiyê çawa derbas bû?

Cindî: Baş derbas bû. Roja şemiyê sibehê hinek dereng rabûm.

Zelal: Di saet çendan de rabûyî?

Cindî: Welleh, ez di dora saet neh û nîvan de hişyar bûm. Hewa pir xweş bû. Lewma ez û dayika xwe em çûn derve ji bo taştê.

Zelal: Çiqaşî xweş! Xweziya we! We taştê çi xwar?

Cindî: Min zeytûn, penêr û hêkên kelandî xwarin. Dayika min jî to û hingivê Wanê yê navdar xwar.

Zelal: We piştî taştê çi kir?

Cindî: Em bêhnekê li nav sûkê geriyan. Paşê em çûne bazarê û me ji min re cotek pêlavên sporê kirin. Paşê dayika min çû malê û ez jî çûm cem hevalên xwe. Te çi kir di dawiya heftiyê de?

Zelal: Roja şemiyê ez her li malê bûm. Min odeya xwe da hev. Piştî nîvro min li bernameyeke muzîkê temaşe kir. Bi şev jî min pirtûk xwend.

Cindî: Ango tu hîç derneketî derve?

Zelal: Mixabin! Lêbelê yekşemê ber bi êvarê ez ligel hevalekî xwe çûm sînemayê. Me li filmê dawî yê Behmen Qobadî temaşe kir.

Cindî: Fîlmekî çawa bû? Te jê hez kir?

Zelal: Fîlmekî pir xweş bû. Ji bîr neke, tu jî temaşe bike.

Cindî: Baş e, ez dê şemiya tê temaşe bikim.

.....

Translation

Zelal: Cindî, how did you spend the weekend?

Cindî: It was good (lit. I spent it well). On Saturday morning I woke up a bit late.

Zelal: At what time did you wake up?

Cindî: Well, I woke up at about 9.30. The weather was very good. Therefore I and my mother went out to have breakfast.

Zelal: How nice! I am jealous! What did you eat for breakfast?

Cindî: I ate olives, cheese and boiled eggs. My mother ate cream and the famous honey from Wan.

Zelal: What did you do after breakfast?

Cindî: For a while we walked around in the market. Then we went to the bazar and

bought a pair of sport shoes for me. Then my mother went home and I went to my friends. What did you do at the weekend?

Zelal: On Saturday I was just at home. I tidied my room. In the afternoon I watched a music program (TV – understood by the verb watch). In the evening I read a book/books.

Cindî: That means that you did not go out (at all)?

Zelal: Unfortunately not! But on Sunday evening I went to the cinema with a friend of mine. We saw the last film by Behmen Ghobadî.

Cindî: How was the film? Did you like it?

Zelal: The film was very good. Don't forget to see it, you too!

Cindî: OK, I will watch it next Saturday.

1.1. Exercise

The sentences below are taken from the text above. Find the sentence of each verb and fill in the blanks paying attention to the form of the verbs.

Rabûm/ çû/ bû/ geriyam/ kir/ xwarin

- a) Em bîstekê li nav sûkê
- b) Ez roja şemiyê hinekî dereng
- c) Te çi di dawiya heftiyê de?
- d) Min zeytûn, penîr û hêkên kelandî
- e) Paşê dayika min malê.
- f) Hewa pir xweş

1.3. Complete the conjugation of the verbs in simple past tense.
(in some sentences you should not add anything)

- a) Ez roja şemiyê, sibehê hinek dereng rabû....
- b) Ez û dayika xwe em çû.... derve ji bo taştê.
- c) Te di taştiyê de çi
- d) Me ji bo min cotek pêlav kirî....
- e) Tu hîç derneket?
- f) Ez roja şemiyê li malê ma....
- g) Ez li malê bû....?
- h) Hûn kengî vegeriya.... malê?

Grammar 7

A) Dema Borî / Simple Past Tense

With intransitive verbs:

Consider first the simple past tense forms of the intransitive verbs **çûn** 'go' and **rabûn** 'get up':

:

Sibehê	<i>In the morning</i>	Ez çûm Wanê	Ez zû rabûm.
Duhî	<i>Yesterday</i>	Tu çûyî Wanê	Tu zû rabûyî.
Pêr	<i>The day before yesterday</i>	Ew çû__ Wanê	Ew zû rabû__.
Par payîzê	<i>Last year in autumn</i>	Em çûn Wanê	Em zû rabûn.
		Hûn çûn Wanê	Hûn zû rabûn.
		Ew çûn Wanê	Ew zû rabûn.

As it is seen in the examples above, for conjugating the intransitive verbs in the simple past tense in Kurmanji, we add a set of personal endings to the **past tense stems** of the verbs. The past stem of the verbs is very simply found by deleting the ending **-(i)n** from the infinitive:

Infinitive	Past stem	
çûn	çû	Em çûn bazarê. <i>We went to the market.</i>
axaftin	axaft	Elî pir baş axaft. <i>Elî spoke very well.</i>
nivistin	nivist	Tu di saet çendan de nivistî? <i>What time did you sleep?</i>
hatin	hat	Em berî du saetan hatin. <i>We came two hours ago.</i>
ketin	ket	Pirtûkên min ketin. <i>My books fell down.</i>
kenîn	kenî	Ez li ber filmî pir kenîm. <i>I laughed too much at the film.</i>

As for the personal endings, the personal endings are the same as they were in the present tenses except for the third person ending. There is no ending for the third person in simple past tense; so, the past stem of the verb functions as the third person conjugation of the verb. Below there is a chart of the endings:

After a vowel		After a consonant	
Ez -m	Em -n	Ez -im	Em -in
Tu -yî	Hûn -n	Tu -î	Hûn -in
Ew --	Ew -n	Ew --	Ew -in

Pirs / Question form: Tu duhî çûyî cem hevalê xwe? *Did you go to your friend yesterday?*
 Hûn sibehê di saet çendan de rabûn? *What time did you get up in the morning?*
 Tu têgihiştî? *Did you understand?*

With transitive verbs:

The way we make sentences with the past tense forms of transitive verbs is quite different from the way we make sentences with other verb forms. Therefore, you will need to pay careful attention to this section. First of all, note that the past stem of the verb itself is made in just the same as it is for intransitive verbs, i.e. deletion of **-(i)n**:

Infinitive	Past stem	Infinitive	Past stem
<i>xwendin</i> 'read, study'	<i>xwend</i>	<i>ditin</i> 'see'	<i>dît</i>

There are **three major changes** in the past tense transitive sentences that must be learned:

First, the same set of personal endings is added to the past stem as we learned above. But the personal endings do NOT refer to the subject, but the **OBJECT**.

Second, the SUBJECT goes into the **Oblique** case.

Consider the following examples, noting these two differences: the oblique case of the subject pronouns, and the ending of the verb:

Min helbestek xwend	<i>I read a poem</i>	Min ew dît	<i>I saw him/her.</i>
Te helbestek xwend		Te ew dît	<i>You saw him/her.</i>
Wî helbestek xwend		Wî/wê ew dît	<i>He/she saw him/her.</i>
Me helbestek xwend		Me ew dît	<i>We saw him/her.</i>

We helbestek xwend We ew dît *You saw him/her.*
Wan helbestek xwend Wan ew dît *They saw him/her.*
 As you can see, the verb forms are in the form for the third person singular (which is the same as the bare stem), because the object in all sentences is third person singular (a poem, or him/her).
Third, the OBJECT is in the absolute or unmarked case.

Compare now the first of the above sentences with the corresponding present tenses forms:

Ez helbestek-ê dixwîn-im *Ez wî dibînim*
 I read/am reading a poem I see him

The differences between sentences with past and present transitive verbs are summed up below:

	Simple present	Simple past
Case of subject	Absolute	Oblique
Case of object	Oblique	Absolute
Person endings on verb	Agrees with subject	Agrees with object

Now observe how the three principles mentioned above apply to the examples below:

Min **tu** dîtî. *I saw you.* Şîlanê cil şûştin. *Şîlan washed the clothes.*
 Min **ew** dît. *I saw him/her.* Mesûdî xwarin çêkir. *Mesud cooked (the meal).*
 Min **hûn** dîtî. *I saw you* Tu duhî li malê bûyî? *Were you at home yesterday?*
 Min **ew** dîtî. *I saw them* Wî çîrok xwendin. *He read (the) stories.*
 Min çivîkek dît. *I saw a bird.* Te çend pirtûk kirîn? *How many books did you buy?*
 Min du çivîk dîtî. *I saw two birds.* Hostayan du xanî ava kirin. *The masters built two houses.*

Note that when the object is plural, the verb gets plural ending *-in*. In this case, the plural conjugation of the past tense transitive verb is in the same form of the infinitive form of the verb. For example, when the plural ending is added to the past stem *dît-*, it becomes *dîtî* which is at the same time the infinitive form of the verb. So, as a practical way, in the past tense plural verbs take the infinitive form of the verb as it is.

Negative, transitive and intransitive verbs:

For yielding the negative form, all other rules being the same, we prefix the negative marker *ne-*, as in:

Min helbest **nexwend**. *I did not read the poem.*
 Min helbest **nexwendin**. *I did not read (the) poems.*
 Gundiyan zeviyên xwe av **nedan**. *The villagers did not water their fields.*
 Elîxanî dersa xwe çênekir. *Elîxan did not study his lesson.*
 Ez zû **ranebûm**. *I did not get up early.*

Grammar 7 (Continue)

B) Past Continuous

For conjugating a verb in past continuous tense, either transitive or intransitive verb, we prefix *di-* to the past stem of the verb. In this sense, the only difference from simple past tense is prefixing the *di-*, all other processes being the same.

Gava ew gihişte malê ez **dinivistim**. *When s/he arrived at home I was sleeping.*
 Rûbarê gundî mîna lehiyê **diherikî**. *The village river was flowing like a flood.*
 Dema ji dukanê derket, dinya êdî tarî **dibû**. *When he got out of the shop it was getting dark.*
 Gava min ew dît, wî cil û berg **dikirîn**. *When I saw him, he was buying clothes.*

Note that the same construction is also used for expressing past habits. See the examples below:

Dema ez zarok bûm, ez tim **hildikişiyam** ser daran. *When I was a child, I used to climb trees.*
 Hingê, em her gav bi hev re **digeriyan**. *Then, we always used to hang out together.*
 Min stran digotin te jî guhdarî **dikir**. *I used to sing and you used to listen.*

Li ber mala me darek hebû û her gav çivîk **dihatine** ser. *There used to be a tree in front of our house and the birds would go on it all the time.*

As for the negative form of the past continuous and past habitual, the negative marker **ne-** is prefixed to the verb. Note that, unlike the present tense negation, the past continuous prefix **di-** remains intact; it is not replaced by the negation marker. Check the examples below:

Dema ez li hundir bûm, baran **nedibarî**. *When I was inside, it was not raining.*

Çaxa ku ez li Wanê bûm, min çu kes nas **nedikir**? *When I was in Wan, I did not know anybody.*

Hindî min jê re digot, fêm **nedikir**. *No matter how much I was telling to him, s/he would not understand.*

Wexta ez hatim vira, min ji bilî Kurdî bi çu zimanan **nedizanî**. *When I came here, I did not know any language other than Kurdish*

Compound verbs in the past tenses

Note that as it was the case with the compound verbs in present tense, all the grammatical processes are applied to the verbal part of the compound verb. See the examples below:

Min sê lire ji wî wergirtin. (wer+girt+in) 'I received three liras from him'

Min her roj sê lire ji wî werdigirtin. (wer+di+girt+in) 'Every day I used to ...'

Me behsa edebiyata kurdî ya nûjen kir. (behs ... kir) 'We discussed modern Kurdish literature'

Me behsa edebiyata kurdî ya nûjen dikir. (behs ... di+kir) 'We used to discuss ...'

Me behsa edebiyata kurdî ya nûjen nedikir. (behs ... ne+di+kir)

2. Exercise

Below there is the folk story that we worked on for conjugating the verbs in present tense in the fourth lesson. Now, read the story and then rewrite it in the simple past tense. The first two sentences are already done and the words that you will need to change are shown in italics.

Text: Kêr û Kevçik

In present tense:

Rojekê, mirovek li malekê *dibe* mêvan. Dema xwarinê *ye*. Kebaniya malê *sifreyê radixe*, *xwarinan* li ser *rêz dike*. Dû re, mêvan gelek li benda kevçikan *dimîne*, lê kebanîya malê *kevçikan nayîne*. *Mêrik* ji kebanîya malê re *dibêje*:

“Sitiya kebanî, ji kerema xwe ji min re kêrekê bîne.” *Kebanî* li ser sifreyê *dinihêre*, tu tiştê ku bi kêrê bê qut kirin *nîn e û dibêje*:

“Mêvanê birêz, tu dê bi kêrê çî bikî?” *Mêvan dibêje*:

“Ez dê guhê xwe jê bikim, bikim kevçik da ku pê xwarinê bixwim.”

In simple past tense:

Rojekê, mirovek li malekê bû mêvan. Dema xwarinê bû. Kebaniya malê sifre raxist,.....

.....

.....

.....

.....

3. Rast (R) an Çewt (Ç) /Right (R) or Wrong (Ç)

Choose the correct conjugation of the verb, simple past or past continuous/habitual.

1. R Ez duhî çûm melevaniyê.
Ç Ez duhî diçûm melevaniyê.
2. ___ Min her roj serê xwe dişûşt.
___ Min her roj serê xwe şûşt.
3. ___ Dema ez zarok bûm min şîr vexwar.
___ Dema ez zarok bûm min şîr vedixwar.
4. ___ Duh êvarê ez li sûkê rast wî hatim.
___ Duh êvarê ez li sûkê rast wî dihatim.
5. ___ Me her sibeh bi hev re taştê dixwar.
___ Me her sibeh bi hev re taştê xwar.

4. Below there are questions about your Saturday. Try to provide real answers.

1. Tu roja şemiyê sibehê li ku derê bûyî?
.....
2. Tu roja şemiyê di saet çendan de rabûyî?
.....
3. Tu kengî ji malê derketî?
.....
4. Te firavîn li ku xwar?
.....
5. Piştî nîvro te çi kir?
.....
6. Tu di saet çendan de hafî malê?
.....
7. Te piştî şîvê çi kir?
.....
8. Tu di saet çendan de nivistî?
.....

5. In each of the sentences below the pronoun is wrong. Rewrite the sentences with the correct form of the pronoun.

1. Min sibehê zû rabûm.
Ez sibehê zû rabûm.
2. Tu min dît.
.....
3. Wî duhî li sûkê geriya.
.....
4. Ew li zarokî dinihêrî.
.....
5. Em her sibeh bi hev re çay vedixwar.
.....
6. Min pênc salan li dukana wî xebitîm.
.....

6. Conjugate the verbs in brackets in the correct tense and form.

25 Rezber / Çarşem

Hevala delal Şagul,

Ez duhî êvarî (gihîştin) vir, Kirmaşanê. Bi rastî şansê min hebû, min otêleke pir rehet û erzan (peyda kir). Îro sibehê zû (rabûn) û min di kafeteryaya otêlê de taştêyeke edetî (xwar). Bi rastî pir xweş(bû). Min pir jê (hez kirin). Dû re(derketin) da ku di nav bajar de bigerim.. Li trimbêlekê siwar bûm û (çûn) *Taqê Bostanê*. Taqê Bostan hem parkeke pir mezin e û hem jî ciheke pir kevnare (bûn). Paşî dîsa li trimbêlekê (siwar bûn) û çûm Bîstûnê. Li wir min figûrên kevnare yên li ser zinaran(dîtin). Ya Rebî! Çiqasî seyr û delal bûn! Min li wir gelek (wêne girtin). Îro pir westiyam û niha li odeya xwe (bêhn vedan) û sibehê jî ez dê (çûn) Ciwanroyê. Li Ciwanroyê Xorî Qela (hebûn). Keleheke pir mezin e. Ez dê li wir jî wênayan bigirim û ji te re (şandin). Ez dê heta sê heftiyên (vegeriyên) Wanê. Wê hingê ez dê bi dût û dirêjî ji te re behsa sefera xwe bikim. Niha bi xatirê te...

Bi xêr û xweşî.

Aram

baran <i>f.</i>	rain
bêhna xwe veda	'he/she took a rest' <i>Selîmî bîstekê bêhna xwe veda</i> 'Salim rested for a while' (3 sg. of the simple past tense for the verb <i>bêhna xwe vedan</i> 'to rest')
bername <i>f. syn.</i> program	program
bi dût û dirêjî	in detail, at length
bi hev re	together
birêz	dear, worthy
bîstekê <i>syn.</i> bêhnekê	for a while
çend	how many/how much (<i>It has also a usage for surprise: çiyayekî çend bilind e!</i> 'What a high mountain')
cil li xwe kirin <i>ant.</i> cil ji ber xwe kirin	to put on <i>ant.</i> to take off one's clothes
cil <i>f. syn.</i> kinc	clothes
cil û berg <i>m.</i>	dress, costume
cîran <i>f.m.</i>	neighbour (<i>çû mala cîranan.</i> '(S/he) went to neighbours.')
çîrok <i>f.</i>	story
çivîk <i>f.</i>	bird
cotek pêlav	a pair of shoes (cot: pair; cot+ek: a pair)
çu kes <i>also</i> tu kes	anybody, nobody
çûn	'we, you, they went' <i>zarok çûn dibistanê</i> 'the children went to school' (pl. of the simple past tense for the verb <i>çûn</i> 'to go')
da ku <i>syn.</i> da, ji bo ku	so that (<i>cilên germ li xwe bike da ku nesax nebî</i> 'wear warm

	clothes so that you do not get sick')
daran (dar f.)	the plural oblique form of the noun <i>dar</i> : tree, stick (<i>min jê re got wan daran nebire</i> 'I told him not to cut those trees.')
dawî	last, end (<i>cara dawî</i> 'last time')
dema <i>syn.</i> <i>wextê, gava, çaxa</i>	when, while, at the time (<i>dema em li gundî bûn, halê me baş bû</i> 'When we were in the village, our situation was good')
derbas bû	'he/she passed' <i>Ciwan zû derbas bû</i> 'Jiwan passed quickly' (3 sg. of the simple past tense for the verb <i>derbas bûn</i> 'to pass')
dereng <i>ant.</i> <i>zû</i>	late
dibîne	'he/she sees' <i>Şerîf bi berçavkan baştir dibîne</i> 'Sharif sees better with glasses' (3 sg. of the simple present tense for the verb <i>dîtin</i> 'to see')
dihatine ser daran	'We, you, they used to climb trees' (pl. form of the past continuous tense for the verb <i>çûn</i> 'to go'; -e: directionality suffix; ser: on)
diherikî	'it was flowing' <i>ava rûbarî bi aramî diherikî</i> 'the water of the river was flowing quietly' (3 rd pers. sg. form of the past continuous tense for the verb <i>herikîn</i> 'to flow')
dîtim	'...saw me' <i>Xezalê ez dîtim</i> 'Khazal saw me' (1sg. form of the simple past tense for the verb <i>dîtin</i> 'to see')
dor f.	turn (<i>dora min e.</i> 'It is my turn.')
dû re <i>syn.</i> <i>paşî, piştire</i>	then, afterwards
edetî	traditional, customary
erzan <i>ant.</i> <i>biha</i>	cheap
filmê dawî	last film
gava <i>syn.</i> <i>wextê, dema, çaxa</i>	when, while, at the time (<i>gava min mar dît, dest û piyên min lerizîn</i> 'When I saw the snake, I shuddered')
geriyan	to wander, to travel
gihişte	'he/she arrived' <i>Zalal duh êvarê dereng gihişte malê</i> 'Zalal arrived home late yesterday' (3 sg. form of the simple past tense of the verb <i>gihiştin</i> 'to arrive, to reach')
guh	ear
guhdarî kirin	to listen to
hêkên kelandî	boiled eggs
her	each; (2) all through <i>ez duhî her li malê bûm</i> 'yesterday I was at home the whole day'
her gav <i>syn.</i> <i>tim, her dem</i>	always
çax <i>syn.</i> <i>heyam</i>	period, term
hîç	none, never
hindî <i>syn.</i> <i>bi qasî</i>	as much as
hinek <i>also</i> <i>hindek</i>	some
hingê <i>syn.</i> <i>wê demê</i>	then
hingiv <i>m.also</i> <i>hingivîn</i>	honey
hosta m.	master

hundir <i>syn.</i> jûr	inside
jê	a contracted preposition meaning <i>from</i> (<i>him/her/somebody</i>) Ex: <i>min duhî Elî dît û min pirtûka xwe jê xwest</i> ‘yesterday I saw Ali and I wanted my book from him’ see Lesson 4
ji bîr neke	do not forget
kebanî <i>f.</i>	housewife
keleh <i>m.</i>	castle
kêr <i>f.</i>	knife
kevçik <i>m.</i>	spoon
kir	‘he/she did’ <i>wî bi qasî deh salan li wir kar kir</i> ‘he worked some ten years there’ (3 sg. of the simple past tense of the verb <i>kirin</i> ‘to do, to make’)
kirîn	to buy
lewma	hence, therefore
li benda (somebody) man	to wait for somebody; Ex: <i>em du saetan li benda otobûsê man</i> ‘we waited for the bus for two hours’
mixabin	unfortunately
navdar <i>syn.</i> meşhûr	famous
mêvan <i>m.</i>	guest
nayîne	‘he/she does not bring’ <i>jinik kevçikan naîne</i> ‘the woman does not bring spoons’ (3 sg. of the simple present tense of the verb <i>anîn</i> ‘to bring’)
nedibarî	‘it was not raining/snowing’ <i>hewa hinekî sar û bi ewr bû lê belê berf nedibarî</i> ‘the weather was a little bit cold and cloudy but it was not snowing’ (3 sg. of the past continuous tense of the verb <i>barîn</i> ‘to rain, to snow’)
nîgar <i>f.</i>	figure
penêr <i>m.</i>	cheese
peyda kir	‘...found it’ <i>Zelalê duhî kêrek peyda kir</i> ‘Zalal found a knife yesterday’ (3 rd prs. snl. form of the simple past tense of the verb <i>peyda kirin</i> ‘to find’)
kevnare <i>syn</i> qedîm	ancient
to <i>f.</i> tomast	cream
rastî yekî hatin	to run into somebody
rehet <i>ant.</i> nerihet	comfortable
rêz dike	‘he/she puts in order’ <i>garson piyalan li ser maseyê rêz dike</i> ‘the waiter puts the glasses in order on the table’ (3 sg. simple present tense of the verb <i>rêz kirin</i> ‘to put (orderly)’, ‘to arrange’)
şandin	to send
şans <i>m.</i>	luck
sefer <i>f.</i>	voyage
ser <i>m.</i>	head
dan hev / serûber kirin	To put in order, to arrange
seyr <i>syn.</i> balkêş, ecêb	interesting

LESSON 8**INTRODUCTION**

In this unit you will discover about the present perfect tense and past perfect tense; and at the same time you will continue to discover more about the usages of the simple past tense.

By the end of this lesson you will:

- have learned how to narrate an event or story by present perfect tense and past perfect tense.
- have learned how to express an event in the past following a previous event in past perfect tense.
- have practiced and deepened your knowledge of all the basic verb forms and also vocabulary related to vegetables and fruits as well as animals.

1. Text: Çîroka Ker û Guran / The story of the donkey and the wolves

Hebû û tunebû, carekê ji caran, li dora gundekî kerekî bêxwedî hebû. Pir rezil bibû. Ji ber ku her kesekî ku tişteki wî hebûye bi wî kerî kiriye û her kesekî ku barekî wî hebûye li wî bar kiriye. Ker êdî ji xelkê bêzar bûye, û bi ber çiyê ve çûye. Di rê de rastî roviyekî hatiye. Rovi gotiye:

-Ho kero, tu diçî ku?

Kerî gotiye:

- Ez ji gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve diçim.

Rovî gotiye:

- Tu min bi xwe re nabî?

Kerî gotiye:

- Ma çima nebim?

Her du bi hev re çûne, çûne rastî beranekî hatine. Beranî gotiye:

- Ho kero, tu diçî ku?

Kerî gotiye:

- Ez ji gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve diçim.

Beranî gotiye:

- Tu min jî bi xwe re nabî?

Kerî gotiye:

- Ma çima nebim?

Ker, rovi û beran bi hev re çûne, çûne rastî dîkekî hatine. Dîkî gotiye:

- Ho kero, tu diçî ku?

Kerî gotiye:

- Ez ji gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve diçim.

Dîkî gotiye:

- Tu min jî bi xwe re nabî?

Kerî gotiye:

- Ma çima nebim?

Ker, rovi, beran û dîk bi hev re çûne, çûne rastî kêvrîşkê hatine. Kêvrîşkê gotiye:

- Ho kero, tu diçî ku?

Kerî gotiye:

- Ez ji gundiyan bêzar bûme, ber bi çiyê ve diçim.

Kêvrîşkê gotiye:

- Tu min jî bi xwe re nabî?

Kerî gotiye:

- Ma çima nebim?

Ker, rovi, beran, dîk û kêvrîşk bi hev re çûne, çûne di rê de kerî gotiye:

- Gelî hevalan, zirra min hat, divê ez bizirrim.

Hevalên wî jê re gotine:

- Mal ava, tu dê çawa bizirî. Em di nav vî çiyayî de ne, gur dê me seh bikin, û dê me hemûyan bixwin.

Kerî gotiye:

- Nabe, divê ez bizirrim.

Axir, kirine û nekirine, ker qayil nebûye. Kerî serê xwe bilind kiriye û dest bi zirrînê kiriye:

- Ahîî, ahîî, ahîî!

Li deverekê nêzikî wan heft gur hebûne. Wan dengê kerî bihîstiye. Her heftan ji hev re gotine:

- Gelo ev çi deng e?

Yekî ji wan gotiye:

- Ka ez biçim, bizanim ev çi deng e.

Hevalên wî gotine:

- De here!

Gur hatiye dîtiye ku ker û hevalên wî di nava mêrgê de ne, bêxwedî ne, hema kêfa wî hatiye û nêzikî wan ve çûye. Ji nişkê ve çûye, xwe avêtiye ser kerî. Kerî jî sitûyê gurî şidandiye û ew zefî kiriye. Beran, Dîk, Rovî û Kêvrîşk bazdane ser gurî û bi vî awayî gur bêbêhn hiştine û paşê berdane.

Gur nîvmirî çûye cem hevalên xwe. Hevalên wî jê pirsîne:

- Birayo, te çi dît?

Gurê nîvmirî gotiye:

- Birano, qet deng nekin. Ez çûm, min qewmek li wê derê dît, kes nebûne. Wan meraq kirine û gotine:

- Çawa?

Wî gotiye:

- Gava ku ez çûm, hema serê min kirin nava du keviran, û bi du çakûçan li min dan. Yekî ji wan yasîn li ser min xwend, yekî çermê min dirand. Yekî jî gora min kola.

Gava guran ev xeber bihîstine, tirs ketiye dilê wan û hemû bi hev re ji wî cihê revîne, û gotine:

- Şikir ji Xwedê re ku em ji ber lepên wan xelas bûne.

Werger / Translation

Once upon a time there was a donkey without an owner. He was in a terrible state, because anyone who had some work would do it with the donkey, and anyone who had a load would load it up on to the donkey. The donkey was tired of the people and headed off towards the mountain. On the way, he met a fox. The fox said:

- Hey Donkey, where are you going?

The donkey said:

- I have become tired of the villagers, I am going towards the mountain.

The fox said:

- Would you take me with you? (literally: you don't take me with you)

The donkey said:

- Why not? (literally: Why do not I take? meaning: yes, ok!)

Both of them set off together, and then they met a ram. The ram said:

- Hey Donkey, where are you going?

The donkey said:

- I have become tired of the villagers, I am going towards the mountain.

The ram said:

- Would you take me with you?

The donkey said:

- Why not?

The donkey, the fox and the ram went on together, and met a rooster. The rooster said:

- Hey Donkey, where are you going?

The donkey said:

- I have become tired of the villagers, I am going towards the mountain.

The rooster said:

- Would you take me with you?

The donkey said:

- Why not?

The donkey, the fox, the ram and the rooster continued on together, then they met a rabbit. The rabbit said:

- Hey Donkey, where are you going?

The donkey said:

- I have become tired of the villagers, I am going towards the mountain.

The rabbit said:

- Would you take me with you?

The donkey said:

- Why not?

The donkey, the fox, the ram, the rooster and the rabbit went on together, on the way the donkey said:

- Oh friends, I feel the urge to bray (literally: my braying came), I must bray.

His friends said to him:

- Hey, what do you mean, bray! (lit. how will you bray). We are in the middle of this mountainous region (lit. within this mountain), the wolves will become aware of us and they will eat us all.

The donkey said:

- There is no other way, I must bray.

Finally, no matter what they did (lit. they did, they did not), the donkey refused to agree. The donkey raised his head and began to bray:

- Ahîî, ahîî, ahîî!

At a place near to them there were seven wolves. They heard the voice of the donkey, all seven said to each other:

- What could that noise be?

One of them said:

- Let me go and find out (literally: know) what that noise is?

His friends said:

- Yes, go.

The wolf went and saw that the donkey and his friends were in the middle of the pasture, without an owner, immediately he was pleased and approached them. Suddenly he ran and threw himself at the donkey. But the donkey squeezed the wolf's neck and held him tight. The ram, the rooster, the fox and the rabbit got on top of the wolf and in this manner knocked the breath out of him (literally: left him without breath), then let him go. The wolf, half dead, went back to his friends. His friends asked him:

- Oh brother, what did you see?

The half-dead wolf said:

- Oh brothers, how could I tell you (lit. don't make a sound). I went and saw a kind/sort (of creatures), that I hope nobody will ever meet (lit. such that may no one see).

The other wolves were curious, saying:

- What were they like?

- When I went they immediately put my head between two stones, and beat me with two hammers. One of them read a Sura of the Koran over me, one of them skinned me (tore my skin). And one of them dug my grave.

When the wolves heard this news, fear came into their hearts and they all fled together from that place, saying:

- Thanks to God that we have been saved from their paws!

1.1 Exercise

a) Read the folk story above once and answer the questions below.

1. Di çîrokê de kîjan ajal (heywan) hene?
2. Kî ji xelkê bêzar bûye?
3. Ker diçe ku?
4. Ker di rê de cara pêşîn rastî kîjan ajalî tê?

b) The sentences below are taken from the text above. Fill in the blanks paying attention to the form of the verbs.

1. Her kesekî ku barekî wî hebûye li wî bar (kirin)
2. Di rê de rastî roviyekî (hatin)
3. Ez ji gundiyan (bêzar bûn), ber bi çiyê ve diçim.
4. Ker û rovî bi hev re (çûn), çûne rastî beranekî (hatin)
5. Kirine û nekirine, ker qayil (ne/bûn)
6. Li deverekê nêzikî wan heft gur (hebûn)
7. Kerî jî stûyê gurî (şidandin) û ew zeft kiriye.
8. Beran, Dîk, Rovî û Kêvrîşk bazdane ser gurî û bi vî awayî gur bêbêhn hiştine û paşê ew (berdan)
9. Wan(meraq kirin) û(gotin)
10. Gava guran ev xeber (bihîstin), tirs ketiye dilê wan û hemû bi hev re ji wî cihî (revîn), û gotine:
- Şikir ji Xwedê re ku em ji ber lepên wan (xelas bûn).

c) Answer the questions according to the fable. Note that the questions are proposing something wrong according to the fable. Try to write the correct answer.

1. Ker di gundê xwe de xweşhal (happy) e?
Ne, Ker di gundê xwe de ne xweşhal e. Ker êdî ji xelkê bêzar bûye.
2. Gelo ker di rê de cara pêşîn rastî kûçikekî hatiye?
.....
3. Gelo ker bi tenê ber bi çiyê ve çûye?
.....
4. Gelo di rê de dikî bang daye (sing out), lewma gur bi wan hesiyane?
.....
5. Dema gur nêzikî ker û heywanên din bûye gelo heywan revîne?
.....
6. Gelo gurî her pênc heywan xwarine?
.....
7. Gelo gur sax û peyt vegeyriyaye cem hevalên xwe?
.....
8. Dawiyê, hemû gur kêfxweş bûne û hemû bi hev re çûne ser heywanan?
.....

2. Peyv / Vocabulary

beran <i>m.</i>	ram	alûçe <i>f.</i>	plum
bizin <i>f.</i>	goat	bihok <i>f.</i>	quince
çêlek <i>f.</i>	cow	tûfirengî <i>f.</i>	strawberry
çûçik/cûcîk <i>m.</i>	bird	findiq <i>f.</i>	hazelnut
dîk <i>m.</i>	cockerel, rooster	gêlaz <i>f.</i>	cherry
ga <i>m.</i>	ox	gûz <i>f.</i>	walnut
gur <i>m.</i>	wolf	hêjîr <i>f.</i>	fig
hesp <i>m.</i>	horse	hinar <i>f.</i>	pomegranate
hirç <i>m.</i>	bear	hirmî <i>f.</i>	pear
ker <i>m.</i>	donkey	lîmon <i>f.</i>	lemon
kêvrîşk/kêrguh <i>f.</i>	rabbit	mûz <i>f.</i>	banana
kew	partridge	porteqal <i>f.</i>	orange
kûsî/kîso <i>m.</i>	turtle	sêv <i>f.</i>	apple
mar <i>m.</i>	snake	tirî <i>m.</i>	grape
masî	fish	tû <i>f.</i>	mulberry
mêş <i>m.</i>	bee	xox <i>m.</i>	peach
meymûn	monkey	zebeş <i>m.</i>	watermelon
mî <i>f.</i>	sheep	pamîdor/bacan/firingî	tomato
mirîşk <i>f.</i>	chicken	gîzêr <i>f.</i>	carrot
mişk	mouse	bîber <i>f.</i>	pepper
pisîk	cat	kartol <i>f.</i>	potato
rovî <i>m.</i>	fox	pîvaz <i>f.</i>	onion
se/kûçîk <i>m.</i>	dog	xiyar <i>f.</i>	cucumber
şêr <i>m.</i>	lion		
<p>Hesp û çêlek heywanên kedî ne. <i>Horse and cows are domestic animals.</i></p> <p>Kew di nav kurdan de pir girîng e. <i>The partridge is very important among the Kurds.</i></p> <p>Alanî wê rojê li nav rêlê hirçek dîtibû. <i>Alan had seen a bear that day in the forest.</i></p> <p>Gur ketibûn nava keriye wan û deh mî û bizinên wan xwaribûn. <i>The wolves had raided in their herd and had eaten ten sheeps and goats.</i></p>		<p>Lavîne heta hingê qet tû nexwaribûn. <i>Lavîn had not eaten mulberries up to then.</i></p> <p>Ez nikarim bîberên tûj bixwim. <i>I can not eat hot peppers.</i></p> <p>Li Kurdistanê ji gûzê bigire heta hêjîrê gelek cure mêwe digihêjin. <i>In Kurdistan from walnut to figs many kinds of fruits are grown.</i></p> <p>Zebeşê Diyarbekirê li hemû Kurdistanê navdar e. <i>The watermelon of Diyarbekir is famous all around Kurdistan.</i></p>	

Navên Ajalan (Heywanan)/Animals

Mêwe û Sebze/Fruits and Vegetables

Grammar 8

A) Present Perfect Tense

In Kurmanji present perfect tense is used to express an event that has taken place in the past and its effect is related to the present situation. In this sense it can be compared to the present perfect tense in English. But it is also often used for the narration of the traditional tales, fables etc. as in the above text. As for the formation of the verbs in the present perfect tense, it changes in intransitive and transitive verbs.

With intransitive verbs:

Consider first the present perfect tense forms of the intransitive verbs *ketin* ‘fall’ and *nivistin* ‘to sleep’:

Ez ji darê ketime . <i>I have fallen from the tree.</i>	Ez duh şev zû nivist ime . <i>I fell asleep early last night.</i>
Tu ji darê keti yî .	Tu duh şev zû nivisti yî .
Ew ji darê keti ye .	Ew duh şev zû nivisti ye .
Em ji darê keti ne .	Em duh şev zû nivisti ne .
Hûn ji darê keti ne .	Hûn duh şev zû nivisti ne .
Ew ji darê keti ne .	Ew duh şev zû nivisti ne .

The above sentences can be expressed in simple past tense as well but when they are expressed in present perfect tense either:

(a) the event is related to present as in:

A- Ekrem çima îro pir westiyayî xuya dike? “Why does Ekrem seem very tired today?”

B- Ew duh şev dereng nivistiye. “He has slept late last night?”

(b) an event or story is narrated as in:

Rojekê kûsî û rovî li ser riyekê rastî hev hatine. Roviya ji kûsiya re gotiye...

“One day the turtle and the fox ran into each other on the way. The fox told the turtle that...”

(c) the speaker is not the witness of the event; s/he narrates a hearsay as in:

A- Mîrza çima îro nehatiye dibistanê? “Why has not Mîrza come to school today?”

B- Dayika wî got ku ew duh ji darê ketiye. “His mother said that he has fallen from the tree yesterday?”

As for the form of present perfect tense, we had learned how to derive the past stems of the verbs to conjugate them in the simple past tense in the previous lesson; for present perfect tense of intransitive verbs, as it is seen above, we again add a set of personal endings to the past tense stems of the verbs. The personal endings, in bold type in the examples above, are shown in the chart below:

After a vowel		After a consonant	
Ez -me	Em -ne	Ez -ime	Em -ine
Tu -ye	Hûn -ne	Tu -iye	Hûn -ine
Ew --ye	Ew -ne	Ew -iye	Ew -ine

Some examples of present perfect tense of some intransitive verbs:

çûn	çû	Ez heta niha sê caran çûme Mehabadê. <i>I have been to Mehabad three times.</i>
axaftin	axaft	Mamoste di civînê de baş axaftiye. <i>The teacher has spoken well in the meeting.</i>
nivistin	nivist	Di wê navberê de du saetan nivistine. <i>They slept two hours during that while.</i>
hatin	hat	Ker di rê de rastî roviyekê hatiye. <i>The donkey has run into a fox on the way.</i>
ketin	ket	Te dizanibû ku kurê wan ji darê ketiye xwarê? Have you known that their son has fallen from the tree?
kenîn	kenî	Wê şevê heta sibehê ji xwe re suhbet kirine û kenîne. <i>That night they have chatted and laughed until morning.</i>
bûn	bû	Li van bajarên mezin em winda bûne. <i>We have been lost in these big cities.</i>

With transitive verbs:

The present perfect tense of transitive verbs in Kurmanji works exactly in the same way as it is with their simple past tense forms, except for the personal endings. In this sense, keeping stable all other rules related to simple past tense, we should simply replace the simple past tense personal endings with the present perfect tense personal endings. Thus, there **are three major changes** in the present perfect tense transitive sentences that must be learned:

First, the same set of personal endings is added to the past stem as we learned above. But the personal endings do NOT refer to the subject, but the **OBJECT**.

Second, the SUBJECT goes into the **Oblique** case.

Consider the following examples, noting these two differences: the oblique case of the subject pronouns, and the ending of the verb:

Min helbestek xwendiyê. <i>I have read a poem</i>	Min ew dîtîye. <i>I have seen him/her</i>
Te helbestek xwendiyê.	Te ew dîtîye. <i>You have seen him/her.</i>
Wî helbestek xwendiyê.	Wî/wê ew dîtîye. <i>He/she has seen him/her.</i>
Me helbestek xwendiyê.	Me ew dîtîye. <i>We have seen him/her.</i>
We helbestek xwendiyê.	We ew dîtîye. <i>You have seen him/her.</i>
Wan helbestek xwendiyê.	Wan ew dîtîye. <i>They have seen him/her.</i>

As it is seen, the verb forms are in the form for the third person singular (which is **past stem+iyê**), because the object in all sentences is third person singular (a poem, or him/her).

The differences between present perfect tense of intransitive and transitive verbs are summed up below:

	Intransitive	Transitive
Case of subject	Absolute	Oblique
Case of object	-	Absolute
Person endings on verb	Agrees with subject	Agrees with object

Check the below examples with different objects and pay attention to the application of the above principles.

- a) Wê **ez** dîtîye. *She has seen me.* Wê **em** dîtîye. *She has seen us.*
 Wê **tu** dîtîyî. *She has seen you.* Wê **hûn** dîtîye. *She has seen you (pl.).*
 Wê **ew** dîtîye. *She has seen him/her.* Wê **ew** dîtîye. *She has seen them.*
- b) Min îro sê piyalên avê vexwarine. *I have drunk three glasses of water today.*
 Te çend pirtûkên kurdî xwendine heta niha? *How many books in Kurdish have you read up to now?*
 Avestayê gelek pirtûkên kurdî çap kirine. *Avesta has published many books in Kurdish.*
 Xanzadê em duhî di konserê de dîtîye. *Xanzad has seen us in the concert yesterday.*
 Her wiha wî **gelek nivîs** di kovara ... *Also, he has published a lot of articles in...*
 Hawarê de weşandîye. *the Hawar magazine.*

Negative, transitive and intransitive verbs:

For yielding the negative form, all other rules being the same, the negative marker *ne-* is prefixed, as in:

Min îro nan nexwariye .	<i>I have not eaten today.</i>
Ew hat lê zarok bi xwe re neanîne . He came but he has not brought the children with him.	
Xezalê hêj ez ferq nekirime .	<i>Xezal has not noticed me yet.</i>
Ev mehek e gundiyan zeviyên xwe av nedane .	<i>It is one month that the villagers have not watered their fields.</i>
Dersê dest pê kiriye, lê şagirt hêj neketine sinifên xwe.	<i>The lesson has started but the students have not entered into their classes yet.</i>

B) Past Perfect Tense (or Pluperfect)

Past perfect tense in Kurmanji functions just as the past perfect tense in English. In this sense, it is used to express an event or situation in the past preceding another past event or situation. Thus, for expressions such as 'we had eaten' (me xwaribû) 'they had left' (ew derketibûn) past perfect tense is used in Kurmanji. Moreover, past perfect tense works, as all other tenses in Kurmanji, in different ways with intransitive and transitive verbs.

With intransitive verbs:

Consider first the simple past tense forms of the intransitive verbs *axaftin* 'speak' and *man* 'stay':

Ez ligel wî axaft ibûm .	<i>I had talked to him.</i>	Ez li wir mab ûm .	<i>I had stayed there.</i>
Tu ligel wî axaft ibûyî .		Tu li wir mab ûyî .	
Ew ligel wî axaft ibû .		Ew li wir mab û .	
Em ligel wî axaft ibûn .		Em li wir mab ûn .	
Hûn ligel wî axaft ibûn .		Hûn li wir mab ûn .	
Ew ligel wî axaft ibûn .		Ew li wir mab ûn .	

The past perfect tense is formed by (1) the past stem+(2) past tense form of **bûn** ‘to be’. In the past stems ending with a consonant, such as axaftin-axaft in the above examples, ‘i’ is inserted between the past stem and the past tense form of **bûn**.

Some examples to past perfect tense of some intransitive verbs:

Ez wê rojê bi qasî neh saetan nivist**ibûm**. *That day I had slept more or less nine hours.*
 Ma tu par çû**bûyî** Lalişê? *Had you been to Laliş last year?*
 Xelîl bi halekî xerab vegeyriyab**û** malê. *Xelîl had returned home in a bad situation.*
 Di qezayê de bi tenê tiliyeke wî şikestib**û**. *In the accident only one of his fingers had broken.*
 Em hêj nû ji malê derketibûn ku telefona min lê da. *We had just gone out of the house that my phone rang.*

With transitive verbs:

Past perfect tense of the transitive verbs are formed in the same way with the intransitive verbs, that is past stem+past tense form of the **bûn**; however, as it is with the other past tenses, the subject goes into oblique case and the verb agrees with the object. Note that in the below examples the verb is conjugated according to the same object (nan) so regardless of the different subjects the verb is in the same form.

Min nan xwarib**û**. *I had eaten.* Me nan xwarib**û**. *We had eaten.*
 Te nan xwarib**û**. *You had eaten.* We nan xwarib**û**. *You had eaten.*
 Wê nan xwarib**û**. *She had eaten.* Wan nan xwarib**û**. *They had eaten*

Note the changes in the conjugation of the verbs according to different objects in the below examples:

Di qada Newrozê de **gelek mirov** kom bib**ûn**. *A lot of people had gathered in Newroz field.*
 Dema ez gihiştîme malê wan **çay** vexwarib**û**. *When I arrived at home they had (already) drank tea.*
 We ew **pirtûk** bi hev re kirib**ûn**? *Had you bought those books together?*
 Zîlanê **Kerem** li dibistanê nas kirib**û**. *Zîlan had got acquainted with Kerem in the school.*
 Xurşîdî duhî **tu** li bazarê dît**ibûyî**. *Xurşîd had seen you in the market place yesterday.*
 Babê min **em** ligel xwe nebirib**ûn** dukanê. *My father had not taken us to the shop (together with himself).*

Negative, transitive and intransitive verbs:

For the negative forms of the verbs the negative marker **ne-** is prefixed as in:

Min marekî ewqasî mezin qet nedît**ibû**. *I had not seen a snake as big as that.*
 Wê şevê wî em **venexwendibûn** şivê. *He had not invited us to dinner that night.*
 Wê rojê tu kesî sparteya xwe çenekirib**û** lê mamoste hîç hêrs **nebibû**.
Nobody had done his homework but the teacher was not annoyed at all.

Wordlist

avêtibû	‘he had thrown’ <i>Beydayê kîlîla malê avêtibû nav deryayê</i> ‘Beyda had thrown the key of the house into the sea’ (3 sg. past perfect tense for the verb <i>avêtin</i> ‘to throw’)
axaftin <i>f.</i>	speech, talk
axir	in conclusion, at the end
bal <i>f.</i>	attention (bal kişandin: to attract attention)
bar <i>m.</i>	load (bar kirin: to load)
bavo	father (vocative case, which means direct address) (it has also a general usage for a specific father similar to <i>bavê min</i> “my father”)
bêbêhn	out of breath (bê: without, out; bêhn: breath)
bêhn dikirin	‘they were smelling’ <i>gurên birçî hestiyên li ser berfê bêhn dikirin</i> ‘the hungry wolves were smelling the bones on the snow’ (3 pl. past continuous tense for the verb <i>bêhn kirin</i> ‘to smell’)
beran <i>m.</i>	ram
berdan	to leave, to release, to set free
berî şivê	before dinner (berî: before; şiv <i>f.</i> : dinner)

bêxwedî	ownerless (bê: without, less; xwedî <i>also</i> xwedan: owner)
bêzar bûn	to get fed up with, to be tired of
ber bi çiyê ve	towards the mountain (ber bi ve: towards somewhere)
bi carekê de	at once
bi hev re	together
bihîstin <i>syn.</i> seh kirin	to hear, to perceive
bilind kirin	to raise
birayo	brother (vocative case, direct address) (“o and yo” are the vocative case markers for masculine nouns as in <i>bav+o; xal+o; heyran+o</i>)
bizanim	‘that I know, I should know etc.’ <i>ez dixwazim rastiya meseleyê bizanim</i> ‘I want to know the truth about (lit. of) the issue’ (1sg. subjunctive form for the verb <i>zanîn</i> ‘to know’)
bizirrim	‘that I bray, I should bray etc.’ <i>ker dibêje divê ez bizirrim</i> ‘The donkey says that I need to bray’ (1 sg. subjunctive form for the verb <i>zirrîn</i> ‘to bray’)
çakûç <i>m.</i>	Hammer
çîrok <i>f.</i>	Story
civandin	‘...gathered them’ <i>dapîrê zarok li dora xwe civandin da ku ji wan re çîrokekê bêje</i> ‘The grandmother gathered the children around herself to tell them a story’. (3 pl. of the simple past tense for the verb <i>civandin</i> ‘to gather’)
çiyâ <i>m.</i>	mountain, (<i>also</i> çiyayî; in oblique case)
da ku	so that, so as to
danîbûn	‘...had put them’ <i>Elî kitêbên xwe danîbûn ser maseyê</i> ‘Ali had put his books on the table’. (3 pl. of the past perfect tense for the verb <i>danîn</i> ‘to put, to leave’)
dayê	Mother (vocative case) (“ê and yê” are the vocative case markers for feminine nouns as in <i>yar+ê; xuşk+ê; dayik+ê</i>)
de here	let you go
delaliyên min	my dears
dendik	the seed
dest pê kirin	to begin, start; they began (<i>saet heştê dest bi leyîstinê kirin</i> ‘They started playing at eight’)
dev <i>m.</i>	mouth
dever <i>f. syn.</i> cih	region
di rê de	on the way
dîk <i>m.</i>	cock
domandin	to continue
alûçe	plum
gelî hevalan	oh friends (<i>gelî</i> is a plural adress form (vocative) with the same function with <i>-(i)no</i> as in <i>heval-ino, bira-no</i>)
gor <i>f.</i>	grave
gotin	to say; word, saying
gur <i>m.</i>	wolf
hebû û tunebû	once upon a time (lit. there was (and) there was not)
hejmartin	to count
helbet	of course
hema	thus
hemûyan	all of them (in the oblique case)
her du	both
herî xirab	the worst (<i>herî + adj</i> is the superlative form of the adjectives as in <i>pirsa herî zehmet, dersa herî hêsan, xaniyê herî mezin</i> ‘the most difficult question, the easiest lesson, the biggest house’)
heta	until
hew	no longer

hiştin	to leave
ho kero	oh donkey
jê	from him/her
ji ber	because of
ji hev re	to each other
ji nişkê ve	suddenly
ka	attention-getting particle (<i>ka ez lê binêrim çawa ye</i> 'now let me have a look at it to see how it is')
kêf <i>f.</i>	enjoy, joy (kêf hatin: to be happy)
kefen <i>m.</i>	shroud
kêm	few; little; lacking
kenîbûn	'we, you, they had laughed' <i>em bi henekên wî pir kenîbûn</i> 'We had laughed a lot at his jokes' (pl. of the past perfect tense for the verb <i>kenîn</i> 'to laugh')
ker <i>m.</i>	Donkey
kes <i>m.f.</i>	person (when used with a negative predicate it means 'anybody')
(bila) kes wî nebîne	lit. may anybody do not see him
kêvrîşk/kêvroşk <i>f.</i>	Rabbit
kirîbûn	'we, you, they had bought' <i>Xezalê du kilo bacan û du kilo jî porteqal kirîbûn</i> 'Xezal had bought two kilos of tomatoes and two of oranges.' (pl. of the past perfect tense for the verb <i>kirîn</i> 'to buy')
kirin nava tiştekî	to put into something
kirine û nekirine	whatever they have done; no matter what they have done
kola	'...dug it' <i>Ev baxçe hemî min bi tenê kola</i> 'I dug the whole garden on myself.' (3 sg. of the simple past tense for the verb <i>kolan</i> 'to dig')
law <i>m. syn. kur</i>	lad, son
lawir/rawir <i>m. syn. heywan</i>	animal
lep	claw
li dora	around (smt.) (<i>li dora malê</i> 'around the house')
loma <i>also lewma</i>	therefore, for this reason
ma	interrogative particle (ma tu nayê bi me re? 'are not you coming with us?')
mal ava	(1) thank you; (2) hey! (an expression used at the beginning of a contrasting statement)
maye	'it remains, it is left' <i>di sarincê de bi tenê hinek penêr maye.</i> 'There is only some cheese left in the fridge.' (3 sg. of the present perfect tense for the verb <i>man</i> 'to remain')
mêr <i>m.</i>	husband, man
meraq kirin	to wonder
mêrg <i>f.</i>	meadow
mêrik <i>m.</i>	man
mêwe <i>f. syn. fêkî</i>	fruit
mezin <i>ant. biçûk</i>	big
nebaş <i>syn. xerab</i>	bad (<i>ne</i> 'not' + <i>baş</i> 'good')
nebiriye	'...has not taken it' <i>Sîdarî sêwana xwe bi xwe re nebiriye îro</i> 'Sîdar has not taken his umbrella today.' (3 sg. negative of the present perfect tense for the verb <i>birin</i> 'to take')
nêzik <i>ant. dûr</i>	close
nîvmirî	half-dead
parve kirin	to share
pencere	window
qayil bûn	to be content, to be convinced
qet <i>syn. hîç</i>	never
qewm	race, people

qîriyan	to scream
rahiştin	to pick
rastî yekî hatin	to come across smb., encounter, meet
revîne	'they have escaped' <i>dema gur dîtine hemû bi hev re revîne..</i> 'Upon seeing the wolf they all have escaped.' (3 pl. of the present perfect tense for the verb <i>revîn</i> 'to escape, to flee')
rezîl bûn	to get into a desperate situation
rovî <i>m.</i>	fox
rû <i>m.</i>	face
sebze <i>m.</i>	vegetable
seh kirin	to hear, to realize
şidandin	to press
şikir	thank (God)
stû <i>m.</i>	neck
şîv <i>m.</i>	dinner
sor bibû	'he had blushed' <i>ji ber nexweşiyê rengê wî sor bûbû.</i> 'He had blushed because of the illness' (3 sg. of the past perfect tense for the verb <i>sor bûn</i> 'to blush, to redden')
tas	bowl
tirs	fear (<i>tirsîn</i> : to fear)
tişte	something (<i>anything</i> when used with a negative predicate)
wiha	thus, such, like this
weke	like, as
xal <i>m.</i>	(1) uncle (mother's brother); (2) dot, point
xeber <i>m.</i>	news
(ji tişteki/kesekî) xelas bûn	to get rid of something or somebody
xirabtir	worse (<i>xirab+tir</i> : 'tir' is the comparison particle as in <i>mezin+tir</i> 'bigger'; <i>baş+tir</i> 'better'; <i>reş+tir</i> 'darker')
xistin	to drop, to beat
xwîn <i>f.</i>	blood
yasîn <i>f.</i>	the name of a sura in the Koran recited when somebody is about to die
yekî ji wan	one of them (one is masculine and in oblique)
zeft kirin	to capture
zer bûn	to become yellow

LESSON 9

INTRODUCTION

In this unit you will repeat some of the verb forms you have learned, and find a brief introduction to two new verb forms: the past perfect (or pluperfect) tense, and the passive voice. At the end of this lesson you will:

- be more fluent in the use of different verb forms
- be able to formulate passive sentences in the commonest tenses
- practice the pluperfect tense
- be able to use some common expressions related to the preparation of foods

1. Text: A short excerpt from the novel *Siyabend û Xecê*

This novel was written by Zeynelabidîn Zinar and published in 1992 by Pencînar publishers in Stockholm. It is an attempt to adapt one of the most famous Kurdish legends, that of Siyabend û Xecê, into the form of a novel. This short passage has been slightly modified compared to the original work. The main character, Siyabend, is spending the night in a bleak and lonely place alone. He has crawled into a thicket (bushes, in Kurdish devî (f.) and is trying to sleep, but he cannot fall sleep. He keeps hearing a voice (deng), but cannot see where it is coming from.

Siyabend ji nava wê deviyê rabû çû kete nava deviyêke din û xwe dirêj kir ku rakeve, lê kir û nekir êdî xewa wî nehat. Erê hêj di xew re neçûbû, dîsa ew dengê berê hat guhên wî; mîna ku yek bangî wî bike. Rabû ser lingan li der û dora xwe nihêrî; lê tu tişt nedît, dîsa xwe li erdê dirêj kir. Dîsa ew deng bihîst; gava kir ku rabe ser lingan, dît ku zilamek li ber lingên wî sekiniye. Dema Siyabendî ew dît, hinekî tirsîya. Paşê li zîlamî nihêrî; lê şev tarî bû, ji ber vê hindê tiştêk jê dernexist. Di wê navberê de qederek bihurî, zîlamê şevê got:

-Siyabendê min. Metirse! Ez Xoceyê Xizir im û qasidê Xwedê me, ji bo alîkariya te hatime vir. Xwedê sozek daye te ku tu bi destên mirovan neyêyî kuştin.

Zîlamê şevê tîrek û kevanek dan Siyabendî, dîsa li axaftina xwe domand:

-Ha ji te re! Xwedê ev tîr û kevan ji bo te wekî diyarî hinartine. Lê rabe, ji vî welatî here! Ev welat êdî ji te re nabe war! [...]

Werger / Translation

Siyabend stood up from that bush, went into another bush and lay down so that he could sleep but whatever he did, he could not sleep. No (lit. yes), he had not fallen asleep yet, when he heard the same voice (lit. that former voice came to his ears) as if it called him. He stood up (on his legs), wandered around but did not see anything, (and then) he lay down again. He heard that voice again; when he was about (lit. when he did) to stand up, he saw that a man was standing in front of his feet (lit. legs). When Siyabend saw him, he got a bit afraid. Then he looked at the man, but the night was dark so he could not notice anything. Meanwhile, some time passed and the man of the night said:

-Dear Siyabend (lit. My Siyabend). Do not be afraid! I am Hodja Xizir and I am a messenger of God and I came to help you. God gave a promise to you that you will not be killed by a human being.

The man of the night gave a bow and arrow and then continued his speech again:

- Here you are. God sent this bow and arrow for you as a gift but get up and leave this country!

This country can't be home for you anymore! [...]

1.1. Exercise

a) Read the text above and answer the questions below.

1. Siyabendî çî bihîst?
2. Zîlamê şevê çîma hatiye?
3. Zîlamê şevê çî dan Siyabendî?

4. Xwedê çi soz da Siyabendî?
5. Li gorî we, Zilamê şevê çima ji Siyabend xwest ku ew biçe welatekî din?

b) The following verb forms are taken from the text. Identify the infinitive form of these verb forms, and write which form they are in (check back to the preceding lessons if you are not sure!). The first ones are done for you:

Conjugated	Infinitive	Meaning
rabû	rabûn	simple past verb form 'get up'
çû	çûn	simple past verb form 'go'
ket(e)	ketin	this is the simple past verb form plus a suffix -e often used with verbs denoting direction, here therefore: go into, enter (literally 'fall')
kir	kirin	simple past verb form 'do'
rakeve	raketin	present subjunctive verb form 'fall asleep'
nehat	hatin	negative form of simple past verb 'come'
bike	kirin	
geriya	gerîn	
nedît	dîtin	negative form of simple past verb 'see'
bihîst	bihîstin	
rabe	rabûn	
sekiniye	sekinîn	
hatiye	hatin	
dernexist	derxistin	negative form of simple past verb ''
Metirse! /this could also be: netirse!/ hatime	tirsîn hatin	
neyêyî kuştin (go to the grammar part below)	hatin kuştin	
domand	domandin	
here/biçe	çûyîn	
rabe	rabûn	

Grammar / Rêziman 9

A) The Passive Voice

- When we use transitive verbs, we can express events and activities involving two things or people. The simplest way of using such verbs is called the 'active' voice: the doer of the action is the subject, and the thing that is done, or that is affected, is the object:
Ez xwarînekê çêdikim. 'I (subject) am making a meal (object).'
Siyabend pirtûkekê dixwîne. 'Siyabend (subject) is reading a book (object)'
- However, we can also make sentences using the so-called passive voice, a particular sentence type using a special form of the verb. In the passive voice, we are only interested in hearing about the person or thing that has been affected, or had something done to it (for example, the meal, or the book in the above sentences).
- To make the passive voice in Kurmanji, we take a form of the verb **hatin** 'come' and combine it with the infinitive of the verb we wish to use:

ACTIVE

Ez xwarinekê çêdikim
Siyabend pirtûkekê dixwîne

PASSIVE

Xwarinek tê çêkirin. 'A meal is being made'
Pirtûkek tê xwendin. 'A book is being read'

- In the passive voice, the old object of the active sentence becomes the subject of the passive one. That means that the oblique case marker (-ê in the above examples) is not needed. The old subject, on the other hand, is normally simply dropped from the sentence.
- The auxiliary verb **hatin** can be conjugated in all persons and tenses. In the above examples, it is the third person of the present tense. The infinitive form of the main verb, on the other hand, always stays the same. The above examples in the simple past tense would be:

PASSIVE, PRESENT TENSE

Xwarinek tê çêkirin.
Pirtûkek tê xwendin.

PASSIVE, SIMPLE PAST TENSE

Xwarinek hat çêkirin.
Pirtûkek hat xwendin.

- As for the negative form of passive construction, we simply negate the helping verb **hatin** in the same way as it is normally negated. But recall the negative form of **hatin** in the present tense. Some examples in all persons in the most familiar tenses and moods are given below:

Simple Present Tense

(I am/will be known= recognised)

Ez tēm nasîn Em tēn nasîn
 Tu tēyî nasîn Hûn tēn nasîn
 Ew tē nasîn Ew tēn nasîn

(I am not/will not be known=recognised)

Ez nayēm nasîn Em nayên nasîn
 Tu nayēyî nasîn Hûn nayên nasîn
 Ew nayê nasîn Ew nayên nasîn

Present Subjunctive

(that I be known= recognised)

Ez bēm nasîn Em bēn nasîn
 Tu bēyî nasîn Hûn bēn nasîn
 Ew bē nasîn Ew bēn nasîn

(that I be not known)

Ez neyēm nasîn Em neyên nasîn
 Tu neyēyî nasîn Hûn neyên nasîn
 Ew neyê nasîn Ew neyên nasîn

Simple Past Tense

(I was known= recognised)

Ez hatim nasîn Em hatin nasîn
 Tu hatî nasîn Hûn hatin nasîn
 Ew hat nasîn Ew hatin nasîn

(I was not known= recognised)

Ez nehatim nasîn Em nehatin nasîn
 Tu nehatî nasîn Hûn nehatin nasîn
 Ew nehat nasîn Ew nehatin nasîn

Present Perfect Tense

(I have been known= recognised)

Ez hatime nasîn Em hatine nasîn
 Tu hatiyî nasîn Hûn hatine nasîn
 Ew hatiye nasîn Ew hatine nasîn

(I have not been known= recognised)

Ez nehatime nasîn Em nehatine nasîn
 Tu nehatiyî nasîn Hûn nehatine nasîn
 Ew nehatiyê nasîn Ew nehatine nasîn

Past Perfect Tense

(I had been known= recognised)

Ez hatibûm nasîn Em hatibûn nasîn
 Tu hatibûyî nasîn Hûn hatibûn nasîn
 Ew hatibû nasîn Ew hatibûn nasîn

(I had not been known= recognised)

Ez nehatibûm nasîn Em nehatibûn nasîn
 Tu nehatibûyî nasîn Hûn nehatibûn nasîn
 Ew nehatibû nasîn Ew nehatibûn nasîn

It is possible to express the doer of the action by using a complex circumposition **ji aliyê.....ve** in front of the helping verb. This is really only used in more formal styles of written Kurdish; it is not part of normal everyday speech.

Du romanên nû **ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve** hatin wergerandin û weşandin.
Two new novels have been translated and published by Istanbul Kurdish Institute.

Lîstika bi navê "Rojnivîska Dînekî" **ji aliyê Gogol ve** hatiye nivîsandin.
The play named Diary of a Madman was written by Gogol.

Divê mirov bibêje ku di destpêkê de îthamên wiha **ji aliyê piraniya mirovan ve** jî dihatin qebûlîkirin.
It should be said that in the beginning such claims were being accepted by most of the people.

Exercise

Change the active sentences below into passive sentences.

- | | |
|--|-----------------------------------|
| a) Mirov bi şev biryanê naxwin. | Biryar bi şev nayê xwarin. |
| b) Êdî mirov cil û bergan bi cilşoyan dişon. | |
| c) Heval nameyan ji hev re dişînin. | |
| d) Kurd piranî çayê vedixwin. | |
| e) Li Tirkiyeyê mirov zêde kovaran naxwînin. | |
| f) Em her roj li malê xwarinê çêdikin. | |

Wordlist

alîkarî <i>f. also</i> arîkarî	help
an / yan	or
ango	in another term, namely
axaftin	to speak
bang (-î yekî) kirin	to call (smb.), (bang: message)
bêbextî <i>f.</i>	treachery, mercilessness
berê	before
bi	with, by, (bi is a preposition which functions as the initial particle of many circumpositions. Ex. <i>Ez bi te re me.</i> 'I am with you.')
bihîst	'...heard it' <i>Siyabendî dengê bihîst.</i> 'Siyabend heard a voice' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>bihîstin</i> 'to hear')
bihurî	'he/she passed' <i>Siyabend di ber mala me re bihurî.</i> 'Siyabend passed by our house' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>bihurîn</i> 'to pass by')
bike	'do!' <i>Wan kartol û balîcanan sor bike ji bo şivê.</i> 'Fry those potatoes and aubergines for dinner' (imperative form for the verb <i>kirin</i> 'to do')
biryar <i>f.</i>	a traditional kurdish dish with meat
çilo <i>also</i> çawa, çito	how
dan	to give
daye	'...have/has given it' <i>Siyabendî hespê xwe daye qaçaxçîyan.</i> 'Siyabend has given his horse to smugglers.' (3 rd prs. sng. present perfect of the verb <i>dan</i> 'to give')
di.....de	in, at (di is a preposition used together with the postposition de) <i>di çîrokê de</i> 'in the story'
dema	when
deng <i>m.</i>	voice
dernextist	'did not take it out' <i>Siyabendî şûrê xwe dernextist.</i> 'Siyabend didn't take out his sword' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>derxistin</i> 'to take out') (tê <i>derxistin</i> (as in the text): to understand, to notice)
dest <i>m.</i>	hand
devî <i>f.</i>	bush
dew <i>m.</i>	airan (a cold drink made of youghurt, in India called lassi, in Iran dugh)
dike	'he/she does' <i>Evîn çi karî dike.</i> 'What does Evîn do?' (3 rd prs. sng. form of the simple present tense for the verb <i>kirin</i> 'to do')
din	other
dirêj	long, tall
diisa	again

dît	'...saw it' <i>Siyabendî zilamek dît</i> . 'Siyabend saw a man' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>dîtin</i> 'to see')
diyari <i>f.</i>	gift
domand	'continued it' <i>Siyabendî meşa xwe domand</i> . 'Siyabend continued his walk' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>domandin</i> 'to continue')
êdî	anymore, no longer
erd <i>m.</i>	land
erê	yes
ev	this
fikar <i>f.</i>	concern
firotin	to sell
gava	when
geriya	'he/she wandered' <i>Siyabend li ber mala wê geriya</i> . 'Siyabend wandered around her home' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>gerîn/geriyan</i> 'to wander around')
giran	heavy, expensive
girtin	to grasp, to take, to hold
goşt <i>m.</i>	meat
got	'...said it' <i>Zilamê şevê got</i> . 'The man of the night said' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>gotin</i> 'to say')
gram	gram
guh	ear
hat	'he/she came' <i>Zilam hate nik Siyabend</i> . 'The man came near Siyabend' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
hatime	'I have come' <i>Ez hatime suhbeta we</i> . 'I have come to your talk' (1 st prs. sng. present perfect form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
hatiye	'he/she has come' <i>Zilam hatiye nik Siyabend</i> . 'The man has come near Siyabend' (3 rd prs. sng. present perfect form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
hawîrdor <i>syn. der û dor f.</i>	environment, aroundhood
hêj	still
here	'go' <i>Here mala birayê min</i> . 'Go to my brother's home' (imperative form for the verb <i>çûn</i> 'to go')
hev <i>also</i> hevdu <i>or</i> hev <i>û</i> din	each other (Ex: <i>Herdu hevalan bi hesret hev hembêz kirin</i> . 'The two friends embraced each other passionately.')
hinartine	'...have/has sent them' <i>Wan çend diyari hinartine bo me</i> . 'They have sent some gifts for us' (3 rd prs. pl. present perfect form for the verb <i>hinartin</i> 'to send')
hinek <i>also</i> hindek	some
îsot <i>f.</i>	hot pepper
jê	from him/her
ji	from
kete	'he/she fell down' <i>Siyabend kete nav bîrekê</i> . 'Siyabend fell down in a well' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>ketin</i> 'to fall down')
kevan <i>f.</i>	bow
kevanek	a bow
kîlo <i>f.</i>	kilo
kir	'...made it' <i>Siyabendî daxwazek kir</i> . 'Siyabend made a wish' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>kirin</i> 'to do/ make')
kir nekir	whatever he/she did.
ku	<i>ku</i> has many different functions in Kurdish, which cannot all be covered here. An easy way to begin to understand <i>ku</i> is to translate it with English <i>that</i> , which also has many different functions. The most important uses of <i>ku</i> are the following: (1) It introduces a relative clause, as in <i>jinika ku hat li vir</i> 'the woman who/that came here', (2)

	It introduces complement clauses, as in: <i>gava dît ku zilamek li ber lingên wî sekiniye</i> '(he) he saw that a man was standing in front of his feet'; (3) It introduces purpose clauses: <i>kir ku rabe ser lîngan</i> '(he) intended (lit. did) so that he would get up / he was about to get up'.
kuştin	to kill
lê	but, however
li	in
metirse!	don't be afraid!
mîna	like, as
mirov	person, human being
mirovan	plural onlique form of <i>mirov</i>
nabe	'it does not become' <i>Ev welat êdî ji te re nabe war!</i> This country can't be home for you anymore! (3 rd pr. sng. form of the simple present tense for the verb <i>bûn</i> 'to be')
nav	inside
nayê	'he/she does not come' <i>Siyabend nayê daweta me.</i> 'Siyabend is not coming to our invitation' (3 rd prs. sng. simple present tense form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
neçûbû	'he/she had not gone' <i>Siyabend neçûbû daweta wan.</i> 'Siyabend had not gone to their invitation' (3 rd prs. sng. past perfect tense form for the verb <i>çûn</i> 'to go')
nedît	'...did not see him/her/it' <i>Siyabendî tu tişt nedît.</i> 'Siyabend didn't see anything' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>dîtin</i> 'to see')
nehat	'he/she did not come' <i>Siyabend nehat daweta me.</i> 'Siyabend didn't come to our invitation' (3 rd prs. sng. simple past tense form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
nekir	'...did not do it' <i>Siyabend tu tişt nekir.</i> 'Siyabend didn't do anything' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>kirin</i> 'to do/ make')
nihêrî also nêrî	'looked at him/her/it' <i>Siyabendî li zîlamî nihêrî.</i> 'Siyabend looked at the man' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>nihêrîn</i> 'to look at')
neyêyî also neyê	'if etc. you don't come' <i>Divê tu li vir pir hişyar bî da ku neyêyî xapandin.</i> 'You should be very careful here not to be deceived.' (2 nd pr. sngl. form of the present subjunctive form for the verb <i>hatin</i> 'to come'; the same verb is used in forming passive forms as in the example above.)
ling m.	leg, foot
nîvro f.	noon
pê	with her/him or smth/smb (it is a contracted form of 'bi wê/wî')
paşî also pişt re	then, later on
qasîd	envoy
gederek f.	for a time
rabû	'he/she stood up' <i>Siyabend rabû ser piyan.</i> 'Siyabend stood up' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>rabûn</i> 'to stand up')
rakeve	'sleep!' <i>Bi şev zû rakeve da ku sibehê zû rabî.</i> 'Sleep early in the night so that you get up early in the morning.' (2 nd pr. sngl. imperative form for the verb <i>raketin</i> 'to sleep')
rehet	comfortable, easy
saletê f.	salad
sed	hundred
sekiniye	'he/she has stopped' <i>Siyabend li ber derî sekiniye.</i> 'Siyabend has stooped in front of the door' (3 rd prs. sng. present perfect form for the verb <i>sekinîn</i> 'to stop, to stay')
ser	on, over
şev f.	night
sêv f.	apple
şevan	at nights
sibeh also sibê f.	morning, in the morning

sozek	a promise
tarî <i>f.</i>	dark, darkness
te	you (in oblique case)
tê	'he/she comes' <i>Siyabend ji gund tê.</i> 'Siyabend is coming from the village' (3 rd prs. sng. simple present form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
tên	'they come' <i>Gundî ji mizgeftê tên.</i> 'The villagers are coming from the mosque' (3 rd prs. pl. simple present form for the verb <i>hatin</i> 'to come')
tenê <i>also</i> bi tenê	alone, only
têr kirin	yo be enough (Ew xwarin têra min dike 'This food will be enough for me')
tîr <i>f.</i>	arrow
tîrek	an arrow
tirşî <i>m.</i>	pickles
tirsiya	'he/she was afraid' <i>Siyabend ji zîlamî tirsîya.</i> 'Siyabend was afraid of the man' (3 rd prs. sng. past simple form for the verb <i>tirsîn/tirsîyan</i> 'to be afraid of')
vê	oblique form of <i>ev</i> 'this' (feminine)
vî	oblique form of <i>ev</i> 'this' (masculine)
vîra	here
wa	here
war <i>m.</i>	place, land
welat <i>m.</i>	country
welatî	citizen
wî	oblique form of <i>ew</i> 'he'
wîsa <i>also</i> wesa	like that, in that way
xwarin	to eat, food
Xwedê	God
yekê	one of them (one is feminine and in oblique)
yekî	one of them (one is masculine and in oblique)
zîlam <i>m.</i>	man
zîlamek	a man

Extra material for all interested (not included in the examination)

Lêkerên têkildarî xwarin û xwarin-çêkirinê / Verbs related to foods and preparing meals

qelaştin	to slice
sor kirin	to fry
qijilandin	to fry
braştin	to grill
pehtin	to cook
qelandin	to roast
kelandin	to boil
qewartin	to hollow out
sar kirin	to cool
xwê pê werkirin	to salt
sotin/şewitandin	to burn

Xwarinên Taştê

penîr	cheese
mast	yoghurt
hingivîn	honey
şîr	milk
xoşav	compote
jajî	a kind of soft cheese
xiyar	cucumber
tamates/bacan	tomates
zeytûn	olives
rîçal	jam
nivîşk	butter
hêkên kelandî	boiled egg

Hindek xwarin û vexwarinên sereke / some essential food and beverages

salete	salad
goşt	meat
nîsk	lentil
birinc	rice
fasûliye	bean
savar	dried crushed wheat
masî	fish
çay	tea
qehwe	coffee
dew	airan (a drink consisting of yoghurt and water, Indian: lassi)

LESSON 10**INTRODUCTION**

In this unit you will have an opportunity to practice the things you have learned by working on a selection of genuine Kurdish texts. We have attempted to select texts from fairly typical genres, and provide translations and notes to the texts as well as complementary exercises for each of them. The texts we have chosen include a contemporary short story from Firat Cewerî, a poem from Berken Bereh and a folk tale.

In addition, we would like to draw your attention to the website:

<http://www.dibistanakurdi.com/index.php>

a Swedish-based website with a lot of very useful resources for learning Kurdish. Under the menu 'çîrok' (story) you will find some short traditional texts which can also be listened to (you will need Flash player on your computer). For this lesson you will need to listen to the the story Pîrê û Rovî first ('The old lady and the fox') on the following link:

http://www.dibistanakurdi.com/cirok2004/pire_ rovi.htm

Text 1: Çîrok / Short story**Çend agahî li ser nivîskar û çîrokê**

Nivîskarê vê çîrokê, Firat Cewerî, di sala 1959an de li gundekî Mêrdînê hatiye dinyayê. Ji serê salên 1980î ve li Swêdê dijî ku li wê derê wekî nivîskar, wergêr û weşangerekî kurd pir navdar bûye. Heta niha romanek û çend pirtûkên çîrokan nivîsandine û her wiha berhemin ji Dostoevsky, Steinbeck, Chechov û Yaşar Kemal wergerandine kurdî. Bi qasî deh salan kovareke edebî ya bi navê *Nûdem* derxistiye. Ji bilî karê xwe yê nivîskariyê, wî weşanxaneyêke bi navê *Nûdem* jî ava kiriye ku bûye yek ji girîngtirîn û serkeftûtirîn weşanxaneyên kurdî. Nûdemê, di sala 1998an de bi edîtoriya Firat Cewerî, koleksiyoneke du cildî ya hemû hejmarên kovara *Hawarê* (ya ku di navbera salên 1932 û 1943an de çap bibû) belav kirin. Di wê kovarê de birayên Bedirxanî û rewsênbirên din ên kurd, bingehên kurmanciya nivîskî ya standard danîbûn. Berhemêke din a pir girîng a Firat Cewerî jî, amadekirina *Antolojiya Çîrokên Kurdî* (2003, du cild) ye; ku bêguman, firehtirîn koleksiyona berdest a edebiyata kurdî ye.

Çîroka ku me ji bo vê dersê bijartîye, li ser adeta kurdan a razana ser banan, ku havînan li Kurdistanê pir berbelav e, hatiye hûnandin. Qehremanê çîrokê, mirovekî ji bajarê Kurdistanê yî Mêrdînê ye, ku demeke dirêj li Ewrûpayê jiyaye. Gava ku di nav xeyalên rabirdûyê de li ser banê xanî li esman û stêrkên ronak temaşe dike, dîngedîngek tê ji mala cînanan. Nivîskar, vê rûdanê bi xuricîna stêrkekê ve girêdide.

Çîrok ji pirtûka nivîskarî ya bi navê *Kevoka Spî* hatiye wergirtin (Swêd, Nûdem, 1996).

Some information on the writer and the story

The author of this short story, Firat Cewerî, was born in 1959 near Mêrdîn in southeastern Turkey, quite near the Syrian border. He has been living in Sweden since the early 1980's, where he has become extremely well known as a Kurdish writer, translator and publisher. He has written a novel and several collections of short stories and has also translated works of Dostoevsky, Steinbeck, Chechov and Yaşar Kemal into Kurdish. He directed a literary magazine called *Nûdem* for about ten years. Apart from his work as a writer, he has also established the publishing company Nûdem as one of the most important and successful Kurdish publishers world-wide. In 1998 Nûdem published a two-volume collection of all the issues of the journal *Hawar* (originally published between 1932 and 1943), edited by Firat Cewerî. In that journal, the Bedirxan (Bedirkhan) brothers and other Kurdish intellectuals had laid the foundations for modern standard written Kurmanji. Another extremely important work of Firat Cewerî is the recent publication of an anthology of Kurdish short stories (*Antolojiya Çîrokên Kurdî*, 2003, two volumes), undoubtedly the most comprehensive collection of Kurdish literature currently available.

The story that we have chosen, picks up a culturally very widespread custom in Kurdistan, namely sleeping on the rooves of houses during the summer. The protagonist of the story is a man from Mêrdîn, a city of Kurdistan, who has lived in Europe for a long time and returned home. While he is deep into the retrospect on the roof of the house looking at the luminous sky and stars, there comes a noise from the neighbour's which the author relates to the slide of a star on the sky. The story is taken from his collection of short stories titled as *Kevoka Spî* (Sweden, Nûdem, 1996).

Stêrkek ji ezmanê me xuricî / A star slid (down) from our sky

- (1) *Piştî bernameyeke televîzyonê, ez bi cangiranî ji pêlekanê re derketim jor û çûm ser xênî.* After (watching) a TV programme, I climbed the stairs sluggishly [**can=body, soul, spirit; giranî 'heaviness', lit. 'with body-heaviness'**] and went up on (to the roof of) the house.
- (2) *Yek ji tiştên ku min deh salan li Ewrûpayê hesreta wê kişandibû jî, razana li ser banan bû.* One of the things that I had longed for [**lit. 'longing of-it draw'**] for ten years in Europe, was sleeping on the roof [**razan-a, razan is the infinitive from 'to sleep', the -a is an Izafe**] [**ban-a, is the colloquial plural form of ban 'roof', whose written standard would be banan 'rooves'**].
- (3) *Mîn gelekî ji razana li ser bên hez dikir û her êvar hetanî nivê şevê min xwe li ser nivînên xwe dirêj dikir, destên xwe dixistin bin serê xwe û min li stêrkên ezmanê welêt dinihêrî.* I liked sleeping on the roof very much [**bên is one of the two singular oblique forms for ban; the other and most commonly used one being banî**] and every evening until midnight I would lie down on my bed, put my hands under my head and stare at stars of the sky of the country. [**this sentence uses the past progressive to express past habits, often translatable as 'used to ...'**]
- (4) *Wê şevê jî min wilo kir.* That night also I did like that. [**wilo 'so, in this manner' There are many regional variants of this word, for example wesa, wisa, wusa...**]
- (5) *Bêyî ku ez kincên xwe ji xwe bikim, min xwe li ser nivînên xwe dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û di bin bayê payizê yê sivik û hênîk de li stêrkên ezmên nihêrî.* Not having taken my clothes off, I lay down on my bed, put my hands under my head and looked at the stars in the sky under the soft and cool autumn wind.
- (6) *Gelo berê jî ezmanê welêt ewçend bistêrk bû?* Were there so many stars in the sky of the homeland before as well? [**lit. was the sky of the homeland (welêt: oblique singular of welat) with so many stars before also**].
- (7) *Çiqas stêrkine xweşik in, çiqas diçirîşîn.* How lovely stars, how much they were sparking.
- (8) *Ez di wê navê de li Leyla û Mecnûnî fikirîm, min ew jî dîtîn.* At that moment I thought of Leyla û Mecnûn [a constellation named after the beloved couple **Laila and Majnun**], I saw them as well.
- (9) *Mîn çavên xwe li riya Kadizê gerand, min ew jî dît.* I glanced at the Milky Way, I saw it as well.
- (10) *Mîn demeke dirêj bala xwe berda Leyla û Mecnûnî ez li benda hevramûsana wan rawestiyam.* For a long time I paid attention [**the idiomatic expression is bala xwe berdan 'pay one's attention to'; the basic verb is dan 'give' with a preverb ber-**] to Leyla û Mecnûn and I waited for them to kiss [**lit. 'rested in the expectation of ...'**].
- (11) *Mîn hevramûsana wan bidîta, min ê* If I had seen them kissing, I would have wished,

- ji xwe re tiştin bixwestana, tiştin hevê bikirana.* hoped some things [**tişt+indefinite plural ending**] for myself.
- (11) *Qet nebe me di zaroktiyê de wilo bawer dikir.* At least we used to believe it like this in childhood.
- (12) *Em heta derengiya şevê li benda hevramûsana wan diman û em wilo di xew re diçûn.* We would wait until late at night for them to kiss [**see (10) above**] **stay in the expectation of their kiss**] and we would fall asleep in that way.
- (13) *Tiştê ecêb, gava ez li wan rojên xwe yên zaroktiyê difikirîm, min xwe mîna zarokan hîs dikir.* The interesting thing (was that), when I was thinking of my childhood days [**lit. 'days of own childhood'**], I would feel like a child [**lit. I would feel myself like the children**].
- (14) *Şewqa stêrkên ezmên ez dibirim salên min yên zaroktiyê.* The luminosity of the stars of the sky [**ezmên is the Oblique singular of ezman**] would take me to my childhood years.
- (15) *Di salên xwe yên zaroktiyê de ez heyrana şewqa elektrîka bajarê Mêrdînê bûm.* In my childhood days I admired the luminosity of the electricity (lights) of the city of Mêrdîn.
- (16) *Nizanim gelo we tu carê bi şev di nêzîkî Mêrdînê re rêwîti kiriye?* I wonder, have you ever travelled close to Mêrdîn in the night time? [**lit. I do not know whether you have ever travelled close to Mêrdîn in the night time?**].
- (17) *Şewqa elektrîkên bajêr wilo germ, wilo dostane ye, bajar ewçend bilind e ku mirov dibêje qey ew bi stêrkên li ezmên re qayîşê dikişîne.* The luminosity of the city lights is so warm, so friendly, the city is so high that you [**lit. man**] might think that it challenges the stars in the sky.
- (18) *Ez di xeyalan de kûr çûbûm.* I was deep in imagination [**lit. I had gone (past perfect tense, see Lesson 8) deep in imagination**].
- (19) *Ez li ezmanê ewqas bilind û bêstûn ecêbmayî mabûm.* I was [**past perfect of man**] surprised at the so high and columnless sky.
- (20) *Di wê navê de ne ji dengê diya min nebûya, belkî ez ê bi saetan ji xeyalên xwe venegeriyama jiyana rastî.* At that moment, if it was not for my mother's voice, perhaps I would not return from my imagination to the real life for hours.
- (21) --- *Ma tu firek çeqilmast venaxwî lawê min?* □ Would you not like to drink a sip of buttermilk, my son?
- (22) *Ez bi dengê diya xwe veciniqîbûm, min ew tasa çeqilmêst a ko hîn qeşaya wê neheliyabû ji destê wê girtibû, çend gulp jê vexwaribûn, min paşê ew tas danîbû ser pîrêketekî li ber serê xwe, min dîsa xwe li ser piştê dirêj kiribû û li ezmanê bê ser û bin û li stêrkên bi şewq û ronî nihêribû.* [**this sentence is in the past perfect throughout**] I was startled by my mother's voice, I had taken that bowl of buttermilk whose glaze had not melted from her hand, I had taken several gulps (sips) from it, than I had put that bowl on a briquet next to my head, I had lied down on my back again and I had looked at the endless [**lit. without top or bottom**] sky and the luminous and shiny stars.
- (23) *Û ez wilo di xew re çûbûm.* And I had thus fallen asleep.
- (24) *Lê ez nizanim çiqas tê de çûbû, ez bi dengê teqîneke ku bêdengî û kerritiya şevê çirand ve şiyar bûm.* However I do not know how much (time) had passed through [**lit. 'in-it had gone', see prepositions in Lesson 4**], I woke up by the sound of a blast which tore apart the silence and stillness of the night.
- (25) *Bi şiyarbûnê re min dît ku ew stêrka li nêzîkî Leyla û Mecnûnî rijiya erdê. [...]* Upon waking up I saw that the star next to Leyla û Mecnûn slid to the Earth. [**section omitted here**]
- (26) *Sibehê zû li mala cîranê me dengên lîlandin û çepikan dihat.* Early in the morning, at our neighbour's house, there was coming the sound of cheering and applause.
- (27) *Min ji diya xwe pirsî, wê got:* I asked my mother and she said: "A star slid from

“Stêrkek ji ezmanê me xuricî, keçika çîrana me ya berzewacê şehîd ket”.

our sky, our neighbour’s daughter who was at the age of marriage has fallen as a martyr” [**the verb is *şehîd ketin*, used generally for people who die in heroic struggles**].

[...]

(28) Her ku roj bilindtir dibû, dengên lîlandin û çepikan zêdetir dibûn.

As the sun was getting higher, the sound of cheering and applauses was getting more and more.

Key expressions from the story.

ji tişteki/keseki hez kirin:

like, love something/someone

bala xwe berdan:

pay attention to

li tişteki ecebmayî bûn:

be amazed at something

xwe dirêj kirin:

lie down, lit. make oneself long

di xew re çûn:

fall asleep, lit. go through sleep

şiyar bûn:

wake up

ji keseki pirsîn:

ask someone ((question)/whether) (ex: Min **ji Zelalê pirsî ka** îmtihana wê çawa derbas bûye.)

li benda keseki/tişteki man/bûn:

to wait for somebody or something

Text 2: Helbest / Poem**Hindek agahî li ser helbestvan û helbestê****Berken Bereh**

Berken Bereh di sala 1954an de li Şirnexê hatiye dinyayê. Di sala 1978an de dest bi nivîsandina bi zimanê kurdî kir. Helbestên wî yekem car di *Tîrêjê* de, yekem kovara bi kurdî li bakurê Kurdistanê, belav bûn. Dû re di gelek kovarên kurdî de helbest û nivîsarên wî hatine belavkirin. Heta niha sê dîwanên (collection of poems) wî derçûne: *Êş* (2001), *Şagirtên Evînê* (2003) û *Pandomîm* (2006).

Ev helbest ji yekem dîwana wî hatiye wergirtin û di vê helbestê de taybetiyên girîng ên welatê helbestvanî li pêş in.

Berken Bereh

Berken Bereh was born in Shirnakh (Şirnex) in 1954. He started to write in Kurdish in 1978. Initially, his poems appeared in *Tîrêj*, the first magazine in Kurdish in the north Kurdistan. Afterwards, his poems and writings were published in many Kurdish magazines. Up to now three poem collections by him have appeared: *Êş* (2003), *Şagirtên Evînê* (2003) and *Pandomîm* (2006).

This poem has been taken from the first poem collections and in this poem some important features of the poet's country are thematized.

Ger hûn bixwazin**If you want**

<p>(1) <i>Ger hûn bixwazin</i> <i>Binasin êş û jan û kovaniyê</i> <i>Şevêkê li welatê min bibin mêvan</i></p>	<p>If you want [ger=if, also. heke, eger. In each stanza the present conditional form is used (See lesson 6); in this sense the first three sentences actually form one single sentence] To get to know pain, sorrow and grief Be guest one night in my country [<i>bibin mêvan</i>, is in imperative form (see lesson 5)]</p>
<p>(2) <i>Ger hûn bixwazin</i> <i>Binasin mirinê</i> <i>Li baskên qulingên koçber binihêrin</i> <i>Bêhna şewatê tê ji wan.</i></p>	<p>If you want To get to know the death Look at the wings of the emigrant cranes They smell burnt [lit. the smell of burning comes from them]</p>
<p>(3) <i>Ger hûn bixwazin</i> <i>Evînê binasin</i> <i>Taldeya rojhilata dilê xwe bipelînin</i> <i>Bê çawa diteyisin bi ken stêrk.</i></p>	<p>If you want To get to know the love Look into the nook of the east of your heart How the stars glare merrily. [bê is a particle giving some emphasis to the word çawa; it cannot be readily translated into English]</p>
<p>(4) <i>Ger hûn bixwazin</i> <i>Welatê min binasin</i> <i>Vekî deriyê agir û rojê</i> <i>Kevoka mirovhez a heftreng</i> <i>Dê bifire bi we.</i></p>	<p>If you want To get to know my country Open [imperative plural of vekirin] the door of fire and sun The human-lover pigeon with seven colors [mîrov (human being)-hez (the verbal element of the complex verb hez kirin 'to like, to love')]; a very frequent way of word formation in Kurdish. Also in similar forms, <i>welat-parêz (patriot)</i>, <i>kitêb-firoş (book-seller)</i>, <i>kef-gîr (colander)</i> etc.]</p> <p>Dê bifire bi we: 'Will fly to you'. [dê is th future particle, see lesson 6; bi we is used to give the meaning of an action towards a certain direction; in this sense, it is more common to use it with a postposition, namely</p>

	in the form of <i>bi we de (towards you)</i>. (see lesson 4)]
--	--

Key expressions from the poem.

xwestin:	to want (the verb following <i>xwestin</i> is always in subjunctive form as in <i>bixwazin binasin/ biçin/bikirin</i>)
mêvan bûn:	to be a guest (As in the poem the verb can be in the form of <i>bûn mêvan</i> also especially in imperative form. Ex: Min jê re got were bibe mêvanê min.)
bê çawa:	how (<i>bê</i> functions more like an attention getting particle here, it does not add substantially to the meaning)
teyisîn:	to glare
mirovhez:	human-lover; human-friendly (mirov-hez)
heftreng:	seven-coloured (heft-reng)
bêhna tiştêkî hatin ji tiştêkî/kesekî:	to smell (lit. the smell of something comes from smt./smb.)

KURDISH-ENGLISH VOCABULARY

Abbreviations: **adj.** = adjective; **Ar.** = Arabic; **ccmp.** = circumposition; **const.** = construct case; **demon.** = demonstrative; **dial. var.** = dialectal variant; **f** = feminine; **impt.** = imperative; **m** = masculine; **mil.** = military; **n.p.** = narrative present (couched in the present tense; past-tense translational value); **obl.** = oblique; **Pers.** = Persian; **pl** = plural; **pron.** = pronoun; **pres.** = present; **subj.** = subjunctive; **Syr. Ar.** = Syrian Arabic; **Tk.** = Turkish; **v.i.** = verb intransitive; **v.t.** = verb transitive (here transitive means that the past tense is formed on the ergative model, not that the verb necessarily takes a direct object either in Kurdish or in English); **voc.** = vocative

*

- a = ya; bi** ~ in the opinion of: *bi a min* in my opinion
- abadîn** eternal
- aborî** economic, financial; *f* economy; ~**zan** economist
- 'aciz** helpless, unable to cope (*ji* with): *ez ji kêzikan zehf aciz im* I am utterly incapable of coping with bugs
- Adar** *f* March
- 'adet** *f* custom; ~**î** ordinary
- aferîde** *m* creature
- aferîn** bravo; ~ **ji ... re** good for ...
- afirandin** *v.t.* to create
- afiş** *f* poster
- aga** aware (**li** of)
- agadarî** *f* information, announcement; awareness
- agah = aga**
- agahdarî = agadarî**
- agir** *m* (obl. **êgir**) fire; ~ **danîn bi** to set fire to
- Agirî** *f* Ağrı, in extreme eastern Turkey
- aheng** *f* tune, tone
- ajotin ajo-** *v.t.* to drive (vehicle); to pass, last (of time): *pir neajotibû ku...* not much time had passed before..., *vê bêdangiya han heta sala 1980 ajot* this silence lasted until the year 1980; ~ **ser** to attack
- al¹** *f* flag, banner
- al¹** red
- ala = al**
- al'al** tulip
- alandin** *v.t.* to twist
- alastîn alês-** *v.t.* to lick
- alaş** thatch; ~**kirî** thatched
- alav** *f* flame
- alayî** *f* troop, regiment
- alet** *m* instrument, tool
- alês- → alastin**
- alfabe** *f* alphabet
- 'alim** *m* scholar
- al¹** *m* side, part; **bi her ~yê ve** in every direction; **dan ~yekî** *v.t.* to put aside, to draw to one side; **ji ~yekî / ji ~kî** on the one hand; **ji ~yê din** on the other hand; **ji ~yê ... ve** by (passive agent), on the part of
- al², arî** *f* help; ~**kar** helping, helpful; ~**karî** *f* help, support; ~**karî kirin** *v.t.* to help: *min alikariya wî dikir* I used to help him
- 'alî³** supreme
- alîkar** partisan; ~**î kirin** *v.t.* to take s.o.'s part, be partisan
- alînegir** neutral
- Alman** German; ~**ya** *f* Germany
- aloz** scattered, random
- amade** ready; ~ **kirin** *v.t.* to make ready; **xwe ~ kirin** *f* to get oneself

KURDISH-ENGLISH VOCABULARY

- ready
- ambelaj** *f* wrapping, packing
- Amerîka/Amerîqa** *f* America; ~**yî** American
- Amûda** *f* 'Amûdâ, a town in Syria near Qâmishlî
- an** or; ~ **na** or not; **an...an** either...or
- ancax** so much
- anîn** *v.t.* (pres. ind. **tînim**, neg. **naynim**; subj. **bînim**, neg. subj. **neynim**) to bring
- anîzazî** *f* cleverness
- Anteqye** *f* Antakya, Antioch
- anuha = niha**
- ap, apo** *m* paternal uncle
- 'aqîl¹** *m* mind, intelligence
- 'aqîl²** intelligent
- 'aqûbet** *f* end
- ardû** *m* fuel
- arî** (dial. var.) = **alî²**
- armanc** *f* aim, goal
- armûş** *m* a sheaf of grain
- armûxan** *m* gift
- arnawid** Albanian
- arşîv** *f* archive
- artêş** *f* army
- arûk** *m* ceiling
- arxayîn** confident
- asê** rugged, steep; ~**geh** *f* fortification
- asê kirin** *v.t.* to catch
- asêwarî** untimely
- asiman, asîman** *m* heaven; ~**î** heavenly
- asîmlasiyon** *f* assimilation
- asîmîle** assimilated
- aso** *f* horizon
- asteng** *m* difficult road, rough terrain, obstacle
- asin** *m* (dial. var.) = **hesin**
- 'aşîq** in love; ~**ê ... bûn** to be in love with
- aşîfî** *f* peace, truce; ease, comfort
- aşî = aşîfî**
- 'atîfî** emotional
- av** *f* water; ~ **û hewa** *f* climate
- ava¹** built up, prosperous, developed; ~ **kirin** *v.t.* to develop; ~**ker** *m* developer, founder
- ava² çûn** *v.t.* to set (of the sun)
- avahî** *f* building, edifice
- avayî = avahî**
- avdayî** tempered (steel)
- avêj-** → **avêtin**
- avêş** *f* balm
- avêtin avêj-** *v.t.* to throw, throw away, throw out; lay (foundation); ~**a ji text de** dethronement; **dest ~ ...** to touch s.th.
- awa** *f* manner, means; **bi ~yekî** somehow; **bi wî ~yî** by this means; **bi hemû ~yî** by all/any means
- awaz** *m* voice, sound, singing
- awir** *f* glance, backward look
- awur** (dial. var.) = **awir**
- ax¹** sigh, ouch; ~ **avêtin** *v.t.* to say ouch
- ax²** *f* land, earth, dirt; ~**a welat** homeland; ~**a Sûriyê** the land of Syria
- axa** *m* (obl **axê**) agha, feudal lord, master
- axaftin axiv-** *v.i.* to speak
- axar** ???
- axil** corral
- axiftin** (dial. var.) = **axaftin**
- axiret** *f* the other world: *mirovê axiretê* an other-worldly person
- axîn** *v.i.* to cry, to cry out
- axpîne** *f* patch of ground, field
- AY = Amerîqayê Yekbûyî** USA
- azad** free; ~ **kirin** *v.t.* to set free; ~**î** *f* liberty
- azar** *f* anguish; ~ **dan** *v.t.* to torment, vex
- azman** *m* sky
- b-** → **birin, bûn**
- ba¹** *m* (obl **bê**) wind
- ba²** *m* turn
- ba³** (prep.) with, in front of, in the presence of; **li ~** with, *chez*

KURMANJI KURDISH

- ba⁴** *m* rheumatism; ~**wî** rheumatic
- babet** *f* regard: *di vê babetê de* in this regard
- babo** daddy
- ba-dan** *v.t.* to turn, twist, wring
- badayî** turned, twisted
- bager** *f* snowstorm
- bahar = bihar**
- bahlîf** *f* pillow
- bajar** *m* (obl **bajêr**) city; ~**î** *m* merchant, citified; ~**van** citizen, city dweller; ~**vanî** urban: *jiyana bajarvaniyê* urban life
- Baku** *f* Baku
- bakurofe** *f* gust of wind
- bakûr** *m* north
- bal¹** *f* wing, arm
- bal²** *f* attention, mind, thought; ~ **kişandin** to attract the attention: *wêneyên min bala rojname û hunermendan kişandin* my pictures attracted the attention of newspapers and artists; ~**dar** attentive, discerning; ~**drêj** patient, careful; ~**fireh** patient, calm; ~**kêş** attractive, interesting
- balaxane** *f* balcony
- balefir** *m* airplane; ~**geh** airport
- balgî** *m* pillow
- balîf = bahlîf**
- ban** *m* roof
- ban ban kirin** *v.t.* to shout, to yell
- bandev** *f* summit
- bandor** *f* influence
- bang** *f* call, cry; ~ **dan** *v.t.* to give out a cry, to herald; ~ **kirin** *v.t.* to shout
- banz = baz**
- bar** *m* load; ~ **bûn** to be loaded; to bear up: *çavên wan bar nebûbû* they hadn't been able to bear the sight; ~ **kirin** *v.t.* to load up, move (household); ~**kêş** *m* porter
- baran** *f* rain; ~**din** *v.t.* to rain down
- bare: di ~ya ... de** (prep.) about, concerning
- barîk** slender, thin
- barîn/~iyan** *v.i.* to rain down
- bask** *m* arm, wing: *baskê çepê partiya sosyal-demokrat* the leftist wing of the Social-Democrat Party; ~**ên xwe li hev xistin** to flap one's wings
- baş** good; ~ **kirin** *v.t.* to improve; ~**kirin** *f* improvement
- başok(e)** falcon
- başûr** *m* south
- bav** *m* (voc. **bavo**) father; ~**îtî** *f* fatherhood, paternity
- bawer** believing: *ez ~ im ku...* I believe that ...; ~ **kirin** *v.t.* to believe: *gelek kes bawer dikin ku...* many people believe that...; ~**î** *f* belief, trust; ~**mend** *m* believer
- bawî¹** *m* father
- bawî² → ba⁴**
- bawîşk** *f* yawn
- baxçe** *m* garden, yard
- baz** jump, leap; ~ **dan** *v.t.* to dance; to run away in fear, to flee in haste
- bazar** *f* market; ~**a reş** black market
- beden** *m* body
- bedew** beautiful, splendid
- bedyûm** ill-omened
- befr** *f* (dial. var.) = **berf**
- behr** *f* sea
- behs** *f* discussion; ~**kirin** *v.t.* to discuss
- bejm** *f* height, stature; ~**bilind** tall; ~ **û bala** tall stature
- bel** straight; ~ **kirin** *v.t.* to straighten, prick up (ears, &c.)
- bela** *f* catastrophe
- belaş** for free, gratis
- belav** widespread, scattered; ~ **bûn** *v.i.* to be scattered; ~ **kirin** *v.t.* to spread, broadcast, disseminate; ~**ok** *f* publication
- belayê nav ... bûn** *v.i.* to spread out through
- belediye** *f* municipality
- belek** speckled, spotted

KURDISH-ENGLISH VOCABULARY

- belekî** *f* water spring
- belengaz** poor, destitute; **~î** *f* poverty, destitution
- bêlê** yes
- belg** *m* leaf
- belgih** *m* suit, clothing; **~ girtin** *v.t.* to garb oneself
- belkî** maybe, perhaps
- ben = bend**
- bend** *f* bond; **li ~a** for the sake of, chained to, waiting for: *divê em êdî li benda sibehê ranewestin* we shouldn't stand around waiting for tomorrow; **~ kirin** *v.t.* to fetter, arrest; **man di ~a** to wait for
- benderuh** creature
- bendewar bûn bi** to love, be in love with
- benzîn** *f* gasoline
- beq** *m* frog
- ber¹** *m* breast, fore; **ber-dan** *see alphabetically*; **~ bi hev hatin** *v.i.* to cooperate; **~ê (ve)** (adv.) before; **~î ku** (conj.) before; **ji ~ kirin** *v.t.* to memorize; **ji ~ jmartin** *v.t.* to reel off from memory; **ji ~ ku** because (conj.); **ji ~ ... ve** (ccmp.) before; **ji ~ zanîn** *v.t.* to memorize; **li ~** (prep.) before, on account of; **li ~** (+ inf.) on the verge of: *ew hêviya ku li ber geşbûnê bû çilmisî* that hope, which was on the verge of blossoming, withered; **wek(e) ~ê** as before
- ber²** *m* yield, fruit; **~ wergirtin ji** to derive a yield from
- beramber** equal, equivalent; **~î** *f* equality; **~î ... kirin** *v.t.* to compare to: *wî ew beramberî Anton Çexov dikir* he used to compare him to Anton Chekhov
- beran** *m* ram
- ber-anîn (ber-în)** *v.t.* to imagine
- berate** *f* carcass
- berban** *m* ceiling
- berberî** *f* comparison
- berbêjî** *f* prediction
- berbiçav** conspicuous
- berbihevhatin** *f* cooperation
- berbînî** *f* imaginary image, vision
- bercênîk** ???
- berçav** visible, clear, before the eyes; **~ anin** *v.t.* to pay attention
- ber-dan** *v.t.* to release, let go; to put on (clothes); to close, stop, give up: *dev ~ ji* to close the mouth to, stop, give up; **~ ser** to direct toward; **tiving ~** to fire a rifle at: *xulamê wî ew da ber tivingê* his servant fired the rifle at him; **xwe ~ ser** to turn oneself toward, direct oneself to
- berdest** servant
- berdewam** continual(ly), constant(ly); **~ kirin** *v.t.* to continue
- berdêl** *f* equivalent; **ji ~a** instead of
- berdêlk = berdêl; bi ~** equivalent in value
- berbere** more and more, ever more; gradually, little by little
- berket** *m* blessing; **bi ~** luckily
- berev = berhev**
- berf** *f* snow
- berferih** spacious; **~ kirin** *v.t.* to open, initiate
- bergeh** *f* view, vista
- berhem** *m* product, literary work; **~bar** productive
- berhev** gathered, collected; **~ kirin** *v.t.* to prepare, gather; **xwe ~ kirin** *v.t.* to pull oneself together
